

GLAUKOS®

Rêbernameya Bikarhênerê Pergala KXL'ê®

Jimareya Modelê: 110-01019





Avedro, a Glaukos Company
30 North Ave.
Burlington, MA 01803 USA
Telefon: +1.781.768.3400



Avedro, a Glaukos Company
30 North Ave.
Burlington, MA 01803 USA
Telefon: +1.781.768.3400



Glaukos Netherlands B.V.
Kloosterweg 1
NL-6412 CN Heerlen
Telefon: +31.20.2801.862



EMERGO EUROPE B.V.
Wertervoortsedijk 60
6827 AT, Arnhem
Holend
Telefon: +31.70.345.8570



Glaukos Germany GmbH
Max-Planck-Str. 36B
DE-61381 Friedrichsdorf
Telefon: +49.6172.8869383



Pergala KXL'ê



Pergala KXL'ê
Kartên Dermanê

Rêbernameya Bikarhênerê Pergala KXL'ê®

ML-000157-KU Rev. 5

12/2025

© 2025 Hemî maf parastî ne.

Mafê Dahênanê, Nîşaneyên Bazirganî, Mafê Kopîraytê

Pergala KXL® dibe ku pêkhatî ji yek an çend daxwazên tomarkirina dahênanê ku li Amerîkayê yan cih û deverên cûrbicûr ên cîhanê hatine derxistin an tîn vekolandin, be.

KXL® markeya bazirganî ya tomarkirî ya Avedro, a Glaukos Company ye. Hemî nermalav û belgenamê di bin mafê kopîkirinê anku copyrights'a kompaniya Avedro, Inc de ne. Avedro ji kompaniyên di bin birêveberî û xwedîtiya tevav a Glaukos® Corporation'ê ye. Glaukos® markeyeke bazirganî ya tomarkirî ya Glaukos Corporation'ê ye.

Microsoft® û Windows® bi rêzê markeyên bazirganî yê tomarkirî û markeya bazirganî yê Kompaniya Microsoft'ê ne. Markeyên din ên bazirganî yan markeyên xizmetên bikarhatî di vê rêbernameyê de mal û heyîtiyên xwediyê têkildar in.

Derbareyê Rêbernameyê

Ev rêbername di formeta elektronîkî de hatiye amadekirin û li Malpera Glaukos'ê bi navnîşana www.glaukos.com berdest e. Ji bo xwendina wê hewceyîya te bi nermalava Adobe Acrobat'ê heye. Ji bo wergirtina belaş a kopîya kaxizî ya vê rêbernameyê (di heyama 7 rojan de), digel xizmetên bikarhêneran a Glaukos'ê li ser jimareya: +1 (844) 528-3376 an jî orders@glaukos.com têkilî dayîne.

Hûrgiliyên vê rêbernameyê dibe ku bêtîr haydarkirina ji pêş ve bihêne guherandin. Ji bo wergirtina rêbernameya herî nû, serdana malpera Glaukos'ê bike. Wêneyên pergala KXL'ê û wîneyên înterfeysa bikarhêner a bikarhatî di vê rêbernameyê de tenê ji bo bikaranîna nimayîşî ye. Teşeyê berhema rasteqîne dibe ku cihêwaz be.

Zêdekirin, kopîkirin an jî veguhestina elektronîkî ya vê rêbernameyê bêtîr wergirtina destûra nivîskî ya ji pêş ve ji Glaukos'ê (ji kompaniyên Glaukos'ê) qedexe ye.

Pêrist

1.	Pêşekî	7
1.1.	Bikaranîna Armanckirî ya Rêbernameyê	7
1.2.	Bikaranîna Armanckirî/Babetên Bikaranînê	7
1.3.	Bikarhênerên Armanckirî	7
1.4.	Atmosfera Bikaranînê ya Armanckirî	7
1.5.	Civata Nexweş a Armanc	7
1.6.	Qedexetiya Bikaranînê	7
1.7.	Babetên Baldariyê	7
1.8.	Dûhatên Pêreyî	8
1.9.	Ragihandina Rûdana Dijber	8
1.10.	Danasînên Hêminiyê	9
1.11.	Hişyariyên Ewlehiya Elektrîkî	9
1.12.	Hişyarî û Têbîniyên baldariya Ewlehiyê li hember Tîrêjê	10
1.13.	Têbîniyên din ên ewlehiyê	11
1.14.	Daxuyaniya Sazgarî digel Pêwîstiyên FCC'yê	11
2.	Pêşekî	12
2.1.	Dîmena Giştî ya Pergalê	12
2.2.	Pişken Serekî	14
3.	Xebitandina pergalê	17
3.1.	Bikaranîna Keyborda pelandinî/Klawyeyê	17
3.2.	Enerjiya Raser-binefş (UV) (Doz)	19
3.3.	Beriya Çalakirina Pergalê	20
3.4.	Amadekirina Pergalê	20
3.5.	Çalakkirina Pergalê	20
3.6.	Karta Çalakkirina Derman	21
3.7.	Piştrastkirina Derman	22
3.8.	Dermankirina Guhertî	22
3.9.	Hevgavkirina Kontrola ji dûr ve	24
3.10.	Xwe-cerribandina hundirîn a Pergala KXL'ê	26
3.11.	Amadekirina Nexweş	26
3.12.	Enduksiyona Rîboflavînê	26
3.13.	Xêzên Arasteyê li gel Reşika Çav a Nexweş Rêk bike	27
3.14.	Destpêkirina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê	29
3.15.	Çavdêriya Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê	30
3.16.	Rawestandina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê	31
3.17.	Betalkirina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê ya Pêşveçûyî	32

3.18.	Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê ya Temambûyî	33
3.19.	Derxistina Rapora Kurteya Dermankirinê	34
3.20.	Temirandinaa Pergala KXL'ê	35
3.21.	Menûya Vebijêrkan	37
3.22.	Menûya Rêxistinên Pergalê	38
4.	Lênerrînî / Servîs	39
4.1.	Polîtîkaya Sazkirinê	39
4.2.	Lênêrîniya Bikarhêner	39
4.3.	Agahdariya Garantîyê	39
4.4.	Agahdariya Peymana Servîsê	39
4.5.	Çareserkirina Pîrsgirêkên Pergalê	39
4.6.	Paqijkirina Pergalê	44
4.7.	Paqijkirina Kunîleyê	44
4.8.	Verastkirina Baskê Movikdar	45
4.9.	Livandina Pergalê	46
4.10.	Embarkirina Pergalê	47
4.11.	Nermalav	47
4.12.	Rîskên Têkildarî Avêtina Hilberên Zevî	47
5.	Destebendîya Cîhazan bike	48
5.1.	Li gorî EN60601-1 Standarda Elektrîkî ya Amûrên Bijîşkî	48
5.2.	Li gorî FCC Beşa 15, EN55011 û EN60601-1-2	48
5.3.	Li gorî EN60825-1 Ewlehiya Hilberên Lazerê	48
5.4.	Li gorî EN62471 Ewlehiya Biyofotobiyolojîk ya Lamba û Pergalên Lambayê	48
5.5.	Li gorî Pêveka II.3 ya Rêbernameya 93/42/EEC	48
5.6.	Pêwîstiyên EMC'yê	48
6.	Sembol / Kurtebej	54
7.	Taybetmendî	57
7.1.	Taybetmendiya Pergalê	57
7.2.	Parametreyên Dermankirinê	58
8.	PÊVEK 1	59
8.1.	Legacy Remote Control (Kontrola ji dûr a kevin)	59
8.2.	Hevgavkirina Kontrola ji dûr a kevin	60
8.3.	Çareserkirina Pîrsgirêkên Kontrola ji dûr a kevin	61
8.4.	Guhertina Bataryayên Kontrola ji dûr a kevin	61

Pêrista Wêneyan

Teşe 1. Dîmena Giştî ya Pergala KXL'ê (Jimareya Modelê: 110-01019)	14
Teşe 2. Pişkên Pergalê û Cihê Labelên Pergalê	15
Teşe 3. Kontrola ji dûr a bêtêl	15
Teşe 4. Labela Pergalê	16
Teşe 5. Labela UV'yê	16
Teşe 6. Labela Destebendiya Leyzerê	16
Teşe 7. Bişkoka çalakirinê (çep) û klîda karebayê (rast)	20
Teşe 8. Şaşeya Sernavê	21
Teşe 9. Rûpela Têrekirina karta Derman	21
Teşe 10. Şaşeya Piştrastkirina Dermankirinê	22
Teşe 11. Hilgirtina Dermankirina Guherîf wek Qasên Pêş-rêxistî yên Klînîkî	23
Teşe 12. Rûpela hevgavkirina kontrola ji dûr ve	24
Teşe 13. Rûpela Herrikbar a rawestana Hevgavkirinaa Kontrola ji dûr ve	24
Teşe 14. Kêşeya hevgavkirina kontrola ji dûr ve	25
Teşe 15. Ekrana Amadekirina ji bo Enduksyona Rîboflavînê	26
Teşe 16. Ekrana Enduksyona Pêşveçûyî	27
Teşe 17. Rêberiya Dîtbarî Di Heyama Enduksyona Rîboflavînê de	27
Teşe 18. Xêzên Sor ên Arasteyê li ser Reşika Çav a Nexweş	28
Teşe 19. Rêkkirina Xêzên Sor ên Arasteyê	28
Teşe 20. Funksyonên Arasteyê yên Kontrola ji dûr ve	28
Teşe 21. Verastkirina Rast a li ser Ekranê	29
Teşe 22. Destpêkirina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê	29
Teşe 23. Ekrana Dermankirina Pêşveçûyî	30
Teşe 24. Rawestandina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê	31
Teşe 25. Rawestanên Dermankirinê Xelas Bûn	32
Teşe 26. Betalkirina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê ya Pêşveçûyî	32
Teşe 27. Ekrana Kurtiya Dermankirina Temambûyî	33
Teşe 28. Ekrana Kurtiya Dermankirina Nekemilî	33
Teşe 29. Derxistina Rapora Dermankirinê bo USB'yê	34
Teşe 30. Têxistina Ajokera USB'yê ji bo Derxistina Raporê	34
Teşe 31. Temamkirina Dermankirinê Bêyî Derxistina Rapora Dermankirinê	35
Teşe 32. Temirandina ji Ekrana Sernavê	35
Teşe 33. Piştrastkirina Temirandina Pergala KXL'ê	36
Teşe 34. Guhestoka Elektrîkê ya Sereke di Pozîsyona Girtî de	36
Teşe 35. Menûya Vebijêrkan	37
Teşe 36. Rêxistinên Pergalê	38
Teşe 37. Gihîştina Parçeya Bateriyê	43
Teşe 38. Derbaskirina Dema Hevgavkirina Kontrolê	43
Teşe 39. Hevgavkirina Kontrolê Bi Serneketî	44
Teşe 40. Baskê Paralel bi Erdê re Saz bike	45

Teşe 41. Pêça Hevsengkirinê A sist bike	45
Teşe 42. Pêça Hevsengkirinê B sist bike.....	45
Teşe 43. Bi Pêça Rêzkirina Hêzê C Tansyona Baskê saz bike	46
Teşe 44. Veavakirina Pergalê ji bo Livandin û Embarkirinê	47
Teşe 45. Kontrola ji dûr a kevin – Dîmena Giştî	59
Teşe 46. Kontrola ji dûr a kevin – Ekrana Hevgavkirina Kontrolê.....	60
Teşe 47. Kontrola ji dûr a kevin – Sync Timeout (Derbaskirina Dema Hevgavkirinê)	60
Teşe 48. Kontrola ji dûr a kevin – Sync Failure (Têkçûna Hevgavkirinê)	61

1. PÊŞEKÎ

1.1. Bikaranîna Armanckirî ya Rêbernameyê

Ev rêbername ji bo bikarhênerên pergala KXL'ê hatiye amadekirin. Hemî destûrkaren bikaranînê, wêneyên berhemê, wêneyên kişandî ji şaşeyê, peyamên peydakirina kêşeyê/çewtiyê û zanyariyên din ên têkildar di vê rêbernameyê de hatine nivîsandin û bicihkirin. Erka bikarhêner e ku hemî destûrkaren ewlehiyê yê nivîsandî di vê rêbernameyê de bi baldarî li ber çav bigire.

1.2. Bikaranîna Armanckirî/Babetên Bikaranînê

Pergala KXL'ê dozeke yeksan û pîvandî ji Tîrêja UVA'yê li devera dermankirinê ya armanckirî dîteyîne ku armanca wî karî teyîsandina ronahiyê li ser cornea (Reşika Çav) di neştergeriyên emeliyata Cross-Linking (Pêwendkirina Alîkî) a reşika çavî ye ku di heyama wê de reşika çav a ku ji ber nexweşî yan neştergeriya şikestî (refraktîv) lawaz bûye, tespît dibe.

1.3. Bikarhênerên Armanckirî

Bikarhênerên Armanckirî yê vê pergalê pisporên rêpêdayî yê bijîşkî ne.



BALDARÎ: Tenê bikarhênerên rêpêdayî û jêhatî dikarin Pergala KXL'ê bi kar bînin.

1.4. Atmosfera Bikaranînê ya Armanckirî

Pergala KXL'ê ji bo bikaranîna navendên dermanî yê profesyonel hatiye berçavgirtin. Ev pergal dikare di atmosferên dermanî yê serpêyî û razandinî, pêkhatî ji klînîka bijîşk, dermangeh û nexweşxaneyê were bikaranîn.

1.5. Civata Nexweş a Armanckirî

Nexweşên ku ji bo tesbîtkirina rewşa reşika çav a lawazbûyî ji ber nexweşî yan neştergeriya şikestî anku refraktîv hewceyî bi pêvajoyên Cross-Linking'ê hene.

1.6. Qedexetiya Bikaranînê

Bikaranîna Pergala KXL'ê di şert û mercên xwarê de qedexe ye:

- Stûriya Reşika Çav, bi berçavgirtina rûpoşê, kêmtir ji 375 Mîkron
- Aloziyên birîna reşika çav
- Kesên tûşbûyî bi nexweşiya Aphakic'ê
- Kesên tûşbûyî bi nexweşiya wek-Aphakic (Pseudophakic) bêyî çandina lenza jêbirina UV'yê
- Jinên ducanî û şîrder
- Zarok

1.7. Babetên Baldariyê

Di kesên tûşbûyî bi nexweşiyên xwarê, bijîşk divê sûdên gengaz ên bikaranîna vê pergalê binirxînin:

- Herpes
- Perçifîna reşika çav
- Herişîna reşika çav a vegerrbar
- Têkçûna reşika çav
- Aloziyên sarêjbûna rûpoşê

1.8. Dûhatên Pêreyî

Qewimîna dûhatên pêreyî gengaz e. nîşaneyên pêşbînîbar dibe ku di pêvajoya dermankirinê de û ji ber bikaranîna dermên an bikaranîna alavên bijîşkî diyar bibin. Ev nîşane dibe ku bi qasa bikaranîna ya asayî û pêşniyazkirî yan jî di pêvajoya bikaranîna asayî ya alavên bijîşkî biqewime. Dûhatên pêreyî têkiliya xwe bi bikaranîna armanckirî ya derman an alavên bijîşkî tune. Bijîşk pirraniya dûhatên pêreyî pêşbînî dike û divê nexweş ji dûhatên pejiwandina derman û terapiyê agehdar bike. Dûhatên pêreyî yê gengaz sînordar in û hêdî hêdî ji holê radibin; weke:

- Tarîbûna bînahiyê
- Pirrxwînîya hevgirane
- Hesta hebûna dargekê li nav çavan
- Tîrsa ji ronahiyê
- Hesta gesticinê/şewatê

Teyîsandina UVA'yê ji Pergala KXL'ê dibe ku dûhatên pêreyî yê nehezkirî bi xwe re bîne. Evana pêkhatî – û ne sînordar bi – babetên xwarê ne:

- Tarîbûna bînahiyê
- Qulbûna Reşika çav (gelekî kêmdîtî)
- Çalakbûna hawkirina reşika çav ji ber Herpesê (HSV)
- Hawkirina reşika çav
- Berfkorî yan Photokeratitis (Fotokeratîti)

Pergala KXL'ê ji bo cihanîna cûreyên pêvajoyên Cross-Linking'a reşika çav ku her yek hevrê digel metirsî û dûhatên pêreyî yê taybetî xwe ne, dihê bikaranîn. Rûdanên nebaş û dûhatên pêreyî yê gengaz ku dibe ku ji ber pêvajoya Cross-Linking'a reşika çav biqewimin, ji nîşaneyên pişkî (weke êşa sivik, hesta hebûna dargekê, tîrsa ji ronahiyê, tarîbûna bînahiyê) heta dûhatên pêreyî yê metirsîdar (weke edema'ya reşika çav, mijdarbûna reşika çav) guherbar e. Dûhatên pêreyî yê gengaz ên pêvajoya Cross-Linking'ê dibe ku pêkhatî (û ne sînordar) bi van babetan bin:

- Tarîbûna bînahiyê
- Guherînên jîrîya dîtinê
- Pirrxwînîya hevgirane
- Edema'ya reşika çav
- Nivîşkaniya rûpoşa reşika çav – mayînde/demdirêj – hêdîbûna pêvajoya baştirbûna rûpoşê
- Delînên reşika çav
- Nezelaliya reşika çav (nezelalî/birîn)
- Birîna reşika çav/hawkirina birînkî ya reşika çav
- Hesta hebûna dargekê li nav çavan
- Çalakbûna hawkirina reşika çav ji ber Herpesê (HSV)
- Hawkirin
- Hawkirina reşika çav
- Enfeksiyona mîkrobî
- Êşa sivik heta navgîn a piştî emeliyatê

1.9. Ragihandina Rûdana Dijber

Rûdanên dijber yan cidî divê bi rêya adresa MedicalSafety@glaukos.com ve bo Glaukos Corporation'ê bihêne ragihandin.

1.10. Danasînên Hêminiye

Di vê rêbernameyê de dibe ku bêjeyên serepeyvî ji bo tekeziya li ser zanyariyên giring ên hêminî û qeyranî bihêne bikaranîn. Ev bêje di dewamê de hatine nasandin.

METIRSÎ: Rewşa metirsîdar a gengaz ku heke, xwe jê dûr negirin, dibe sebaba mirin an zirara cidî.

HÎŞYARÎ: Rewşa metirsîdar a gengaz ku heke, xwe jê dûr negirin, dibe ku bibe sebaba mirin an zirara cidî.

BALDARÎ: Rewşa metirsîdar a gengaz ku heke, xwe jê dûr negirin, dibe ku bibe sebaba qewimîna zirarên pişkî yan navgîn an jî ziyarlêketina li amûr an kelûpelan.

GIRING: Têbîniya pêkhatî ji zanyariyên giring ku têgihîştina destûrkaran hêsantir dike.

BÎRXISTIN: Têbîniya pêkhatî ji zanyariyên tevavker ku têgihîştina destûrkaran hêsantir dike.

1.11. Hişyariyên Ewlehiya Elektrîkî

Bikaranîna vê amûrê pêwîstî bi berçavgirtina xalên baldariyê yên taybet di warê sazgeriya elektromagnetîkî (EMC) heye. Amûr divê li gorî zanyariyên EMC'yê yên nivîsandî di vê rêbernameyê de bihê sazkerin û bikarxistin.

Alavên gerrok û hevrê yên tîkiliyên RF'ê dibe ku bandorê li xebata alavên bijîşkî yên karebayî, weke Pergala KXL'ê ya Glaukos'ê bikin.

Ji bo dîtina zanyariyên destebendîkirina cîhazan, serdana Beşa 5: Desstebendîya Cîhazan bike.

Pergala KXL'ê tenê digel berhemên Glaukos'ê yan jî berhemên piştrastkirî ji aliyê Glaukos'ê ve sazgar e. Glaukos'ê tu berpirsyariyek der heqê zirardtîna an jî xirabiya alavê ku ji ber bikaranîna parçeyên ne-rêpêdayî biqewime, tune.

 Hişyariyên Ewlehiya Elektrîkî	
1.	Karûbarên nûjenkirinê yan servîskariyê divê tenê ji kedkarên pişspor û jêhatî yên Glaukos'ê re bihê spartin. Bêyî destûra çêker, guherînan di amûrê de pêk neyîne.
2.	Ji bo rêgirtina li lêketina karebayê, ev amûr tenê divê li dergeha karebayê ya xwedî girêdana parêzvan a erdê bihê girêdan. Ji bo veqetandina pergalê ji karebayê, duşaxê tîla karebayê bigire û ji dergeha karebayê veqetîne. Ev pergal ji bo çalakiya berdewam digel girêdera derveyî hatiye çêkirin.
3.	Ev amûr bo voltaja metirsîdar ku dibe ku bibe sebaba lêketina karebayê, şewat an heta mirinê, dixebite. Ji bo pêşgirtina ji lêketina karebayê û neketina ne bi dilxwazî ya ber UVA'yê, xwe ji rakirina sefheyên neguher ên amûrê dûr bigire. Hemî karûbarên servîskirina pergalê, ji bilî babetên nivîsandî di vê rêbernameyê de, tenê divê ji karmendên xizmetguzar ên rêpêdayî û pişpor ên Glaukos'ê re bihê spartin.
4.	Beriya servîskirin an paqijkirinê (jêbirina gemariyê) ya amûrê, pergalê bitemirîne û ji dergeha karebayê ya dîwarî veqetîne. Ji bo veqetandina tîla karebayê ji dergehê, tu wextî tîla karebayê nekişîne. Duşaxa tîla karebayê bigire û ji dergehê veqetîne. Amûr divê bi awayekî cih bigire ku veqetandina tîla karebayê ji dergehê dijwar nebe.
5.	Amûra ku tîla karebayê ya wê zirar dîtiye, bi kar neyîne.



Hişyariyên Ewlehiya Elektrîkî

6.	Têla karebayê bi awayekî çîgir bike ku gengaziya gîrkirina (li) têtê, pêlêkirin, gevizîn, alîn, tewîn, qurmiçîn an veqetiyana nişkêvayî ya têla karebayê ji dergeha karebayê ya ser dîwêr ji nav biçe.
7.	Amûrê li nêzikî avê bi kar neyîne û haya te ji têketina şilemeniyên bo nav amûrê yan parçeyên wê hebe.
8.	Pergala KXL'ê li nêzikî madeyên şewitbar an hişber bi kar neyîne.
9.	Tu wextî rasterast li tîrêja ronahiya UV'yê mêze neke. Tu wextî, ji bilî bikaranînen dermanî, tîrêja UV'yê ber bi mirov ve negire.
10.	Berçavnegirtina rêzikên xwecihî yê têkildarî bikaranîna amûrên bijîşkî yê elektrîkî-ronahîyê dibe ku bibe sebaba xirabiya ji ber lihevketina elektro-magnetîkî.
11.	Kontrola ji dûr ve yan pêkhatî bi bateriyên guherînbar dixebite. Heke bixwazî pergale bo demeke dirêj bêkêr bihêlî, divê bateriyên jê derxî.
12.	Bikaranîna alavên pêreyî yê nerêpêdayî dibe ku bibe sebaba derketina kêşeyê li amûrê.
13.	Funksyona vê pergale dibe ku ji ber çalakiya amûrên din, ku heta bi pêwîstiyên weşandina CISPR'ê jî sazgar in, aloz bibe. Serdana Beşa 5: Desstebendîya Cîhazan bike.
14.	Vê amûrê li rex alavên din ên elektrîkî yan di rewşa çîgîrbûyî li ser amûra elektrîkî ya din bi kar neyîne ji ber ku karayîya wê dibe ku aloz bibe. Heke bikaranîna amûrê di vê rewşê de pêwîst be, divê duristiya xebata vê amûrê û amûra din a karebayî bişopînin.
15.	Navbira alavên telekomê yê RF'ê ên hilgirbar (pêkhatî ji alavên pêreyî weke kabl û antena derveyî) digel her yek ji parçeyên pergala KXL'ê (110-01019) pêkhatî ji kablên diyarkirî ji aliyê çêker ve, nabe ku kêmtir ji 30 cm (12 inç) be. Heke wisa nebe, karayîya amûrê dibe ku kêmtir bibe.
16.	Servîskirin an hilgirtina pergale di heyama ku mijûlî xebatê de ye, qedexe ye.
17.	Nesazgar digel MR'ê – ji amûra wênekişandinê bi şideta magnetîkî dûr bigire.
18.	Amûra nivîşkan an xirabbûyî bi kar neyîne. Bikaranîna çend alavan dibe ku zirar û zîyanê li nexweş bide.

1.12. Hişyarî û Têbîniyên baldariyê Ewlehiyê li hember Tîrêjê



Hişyariyên Ewlehiya Teyîsandinê

1.	Ji bo rêgirtina li veteyîsîna tîrêja UV'yê ji astên metalî yê saf, tenê amûrên rêza leyzerê bi kar bîne.
2.	Ev amûr tîrêja UV'yê belav dike. Çav û çerm ji berhemên bêparêz dûr bigire. Tu wextî, ji bilî bikaranînen dermanî, tîrêja UV'yê ber bi mirov ve negire.
3.	Ev lampe tîrêja UV'yê belav dike. Gengaziya zirardîtina çerm an çav heye. Çav û çerm nexer ber lampeya bêparêz.



Têbîniyên Baldariyê yê ewlehiyê li hember Tîrêjê

1.	Ev lampe tîrêja UV'yê belav dike. Nerihiya çerm an çav. Asta berketina tîrêjê bigihêje rêjeya herî kêr.
2.	Ev lampe tîrêja UV'yê belav dike. Berketina tîrêjê bo heyama zêdetirji 15 deqeyan di rojê de, dibe ku bibe sebaba tûşbûna bi pîrsgirêkên çerm an çavî. Alavên parastinê yê guncan bi kar bîne.

1.13. Têbîniyên din ên ewlehiyê

Pêkanîna guherînê di tîrêja ronahiyê ya derveyî ya pergale bi rêya hêmanên ronahiyê qedexe ye.

Tîrêja ronahiyê dibe ku zirarê bigihêne alavên plastîkî, weke parêzerê çav û bibe sebaba xirabbûna berhemê. Loma tenê alavên pêreyî yê pêşniyazkirî yê Glaukos'ê an jî alavên neştergeriyê yê ji polaya jengnejen, rêpêdayî ye.

1.14. Daxuyaniya Sazgarî digel Pêwîstiyên FCC'yê

Ev amûr hatiye testkirin û sazgarbûna wê digel sînardariyên amûra dijîtal a Rêza B, anegorî Beşa 15 ji "Qanûnên FCC'yê" hatiye piştrastkirin. Ev sînardarî ji bo pêkanîna parêzbendîya maqûl li hember pêkdan û dijheviya ziyanbar di atmosfera niştecihbûnê de hatiye sepandin. Ev amûr xwedan şiyana pêkanîn, mesrefkirin û belavkirina enerjiya frekansa radyoyî ye û heke li gorî pêwîstiyên vê rêbernameyê neyê sazkirin û bikaranîn, dibe ku bibe sebaba pêkanîna dijhevî û pêkdanê di têkiliyên radyoyî de. Helbet tu misogeriyek tune ye ku pêkdan di şewazên sazkirinê yê taybet de neqewime.

Heke ev amûr bibe sebaba qewimîna pêkdanê di şiyana wergirtinê ya radyo yan televîzyonê, ku bi çalakikirin û neçalakkirina amûrê dikare were têderxistin, baştir e ku bikarhêner pêkdan û dijheviyê bi kiryareke xwarê ji holê rabike:

- Tûş an jî cihê antenna wergir biguherîne.
- Navbira amûr û wergir zêde bike.
- Amûrê li dergeha karebayê ya girêdayî bi xelekeke serbixwe ji xeleka dabînkirina karebaya wergir girêbide.
- Sardana rêbernameya belavkera xwecihî ya Glaukos'ê bike.
- Ji bo berçavgirtina pêwîstiyên belavkirina FCC'yê, bkaranîna kablo û pêwendên parêzdar û xwedî girêdana li erdê pêwîst e. Kablo û pêwendên guncan dikarî ji Glaukos'ê dabîn bikî. Glaukos'ê ji ber pêkdana radyoyî yan televîzyonî ya ji ber guherîn an verastkirinê nerêpêdayî yê vê amûrê tu berpirsariyek tune ye. Pêkanîna guherîn an verastkirinê nerêpêdayî dibe ku mfê sûdwergirtina ji amûrê ji bikarhêner bistîne.

2. PÊŞEKÎ

2.1. Dîmena Giştî ya Pergalê

Pergala KXL'ê amûreke bijîşkî ya karebayî ye ku ronahiya raser-binefş (UV - ultraviolet) (dirêjahiya pêlê ya 365 nano-metre) bi rêçkeyên glover û pehn-tîrêj ber bi reşika çav ve dîtewîsîne. Teyîsandina ronahiyê piştî bikaranîna şilekiya Rîbofavlînê (riboflavin) pêk tê. Lêketina tîrêjê li Rîbofavlînê dibe sebeba azadbûna oksîjena tekane û pêkhatina pêwendên molekulî li kolajêna reşika çav û reqbûna reşika çav bi rêya cross-linking'ê. Dema cereyan û teyîsandina tîrêja raser-binefş (UV) (an jî heman ceryan) li reşika çav bi rêya pergala komputerî ya bicihkirî li nav pergale dihe kontrolkirin.

KXL pergala hilgirbar bi baskê movikdar e ku derfeta cîbicîkirina pergale ji bo hevastkirina tîrêja raser-binefş (UV) digel reşika çav a nexweş dabîn dike.

Sazûkara teyîsandina UVA'yê û kamerayê li beşa The optics head (serî ya ronahiyê) bi cih bûye. Ev pergale tîrêja UVA bi dirêjahiya pêlê ya 365 nm (+/- 8 nm) bi şideta teyîsandina guherbar a 3 mW/cm² heta 45 mW/cm² belav dike.

Ji bo berhemanîna devereke teyîsandina glover û yekparçe di asta dermanî ya çaverêkirî de, kunîleyek bi qalindiya derdora 9 mm dihe bikaranîn. Ji bo lêhûrkirina tîrêjê li ser reşika çav, leyzera hevast dihe bikaranîn. Pêvajoya cîgirkirina deqîq a tîrêja raser-binefş (UV) bi kontrola ji dûr vey a bêtêl dihe birêvebirin. Pêwenda bikarhênerî derfeta bijartina şideta dermanî û enerjîya giştî dide bikarhêner.

Pergala KXL'ê bi şilekiya Rîbofavlînê û karta derman a RFID'ê dihe bikaranîn. Her karta derman pêkhatî ji hejmara dorên terapiyê û bereya paramettrên hilbijêrbar ên terapiyê (ji bo dermanekî taybet) e. Sardana xiştaya hember ku pêkhatî ji şiroveyên têrtijî li ser formûleya Rîbofavlînê, derman û kartên dermanî yên têkildar e, bike.

BÎRXISTIN: Zanyariyên formûleyê li "Destûrkarên Bikaranînê" (IFU) ya têkildarî Rîbofavlînê hatiye raberkirin.

Riboflavins		
Brenda Formûleyê/ Derman	Kartên Dermankirinê	
Dermanê VibeX® Xtra/ Lasik Xtra® 10 Kart JÊDER: EP-004363 1 Kart JÊDER: 520-004393		Avedro, a Glaukos Company 30 North Ave., Burlington, MA 01803 USA +1.781.768.3400 www.glaukos.com EC REP Glaukos Netherlands B.V. Kloosterweg 1 NL-6412 CN Heerlen +31.20.2801.862 MD (01)00855574003205 REF EP-004363 LOT 1234 YYYY-MM-DD Glaukos Germany GmbH Max-Planck-Str. 36B DE-61381 Friedrichsdorf +49.6172.8869383 UDI (01)00855574003205 (10)1234 (11)YYMMDD
VibeX® Rapid/lezzgîn bêyî rûpoşeya (epi-off) 10 Kart JÊDER: EP-004365 1 Kart JÊDER: 520-004391		Avedro, a Glaukos Company 30 North Ave., Burlington, MA 01803 USA +1.781.768.3400 www.glaukos.com EC REP Glaukos Netherlands B.V. Kloosterweg 1 NL-6412 CN Heerlen +31.20.2801.862 MD (01)00855574003168 REF EP-004365 LOT 1234 YYYY-MM-DD Glaukos Germany GmbH Max-Planck-Str. 36B DE-61381 Friedrichsdorf +49.6172.8869383 UDI (01)00855574003168 (10)1234 (11)YYMMDD
VibeX® Rapid/ kevneşopî bêyî rûpoşeya (epi-off) 10 Kart JÊDER: EP-004461 1 Kart JÊDER: 520-004468		Avedro, a Glaukos Company 30 North Ave., Burlington, MA 01803 USA +1.781.768.3400 www.glaukos.com EC REP Glaukos Netherlands B.V. Kloosterweg 1 NL-6412 CN Heerlen +31.20.2801.862 MD (01)00855574003182 REF EP-004461 LOT 1234 YYYY-MM-DD Glaukos Germany GmbH Max-Planck-Str. 36B DE-61381 Friedrichsdorf +49.6172.8869383 UDI (01)00855574003182 (10)1234 (11)YYMMDD
Dermankirina Kîta Tra- Epithelial / Tra- Epithelial 10 Kart JÊDER: EP-004369 1 Kart JÊDER: 520-004396		Avedro, a Glaukos Company 30 North Ave., Burlington, MA 01803 USA +1.781.768.3400 www.glaukos.com EC REP Glaukos Netherlands B.V. Kloosterweg 1 NL-6412 CN Heerlen +31.20.2801.862 MD (01)00855574003229 REF EP-004369 LOT 1234 YYYY-MM-DD Glaukos Germany GmbH Max-Planck-Str. 36B DE-61381 Friedrichsdorf +49.6172.8869383 UDI (01)00855574003229 (10)1234 (11)YYMMDD


2.2. Pişkên Serekî

Pişkên serekî yê pergala KXL'ê (jimareya modelê: 110-01019) pêk dihên ji:

- Optics head (Serikê Optîk) bi çavkaniya raser-binefş (UV) û kamerayê
- Konsûla KXL'ê bi pêwenda bikarhêneriyê
- Kontrola ji dûr vey a bêtêl (bi bateriyên guherînbar)
- Kabla karebayê ya AC ya rêza nexweşxaneyê (Kilîlbar / Veteqtênbar)



Teşe 1. Dîmena Giştî ya Pergala KXL'ê (Jimareya Modelê: 110-01019)




Teşe 2. Pişkên Pergalê û Cihê Labelên Pergalê



Teşe 3. Kontrola ji dûr a bêtêl


BÎRXISTIN: Di rewşa bikaranîna kontrola ji dûr a asayî, ji bo wergirtina zanyariyan li ser şêwaza bikaranîn û peydakirina kêşeyê sardana “Pêveka 1” bike.



Teşe 4. Labela Pergalê



Teşe 5. Labela UV'yê










Teşe 6. Labela Destebendiya Leyzerê

3. XEBITANDINA PERGALÊ

3.1. Bikaranîna Keyboarda pelandinî/Klawyeyê

Nav û şîrove/yên klîdên giring ên şaşeya pelînbar û sembolên tîkildarî bikaranîna Pergala KXL'ê di xîştaya xwarê de hatine raberkirin. Beşa 2.2: Pişkên Serekî pêkhatî ji danasîn û şîroveya pişkên sereke yê Pergala KXL'ê ye.

Sembol	Şîrove/Funksyon
	Raporên xizmetê ragihîne.
	Heke pêş-testa damezirandina pergalê sernekeftî be, divê pergalê ji nû ve damezirîn.
	Kareba konsûlê qut dike.
	Rêxistina pergalê nîşan bide. Bijarde pêkhatî ji eyarkirina pergalê, rêxistina servîsê û haleta testê (demo) ye.
	Menûya rêxistina amûrê dihê nîşandan. Rêxistin anku eyarkirin pêkhatî ji bilindiya deng, hevsengiya sipîtiya kamerayê, zimanê pergalê, derxistina rapora servîsê û asta nîşandana hêlên rêxistina hevastiyê ye.
	Îmkana serrastkirina parametrên pêşbîr anku girîmaneyî. Rêxistin pêkhatî ji peydakirina kêşeyên pergalê, rêxistinên avaker (jimareya rêza Serikê, jimareya rêza pergalê), kalîbrasyona raser-binefş (UV) û guherandina roje û saetê ye. BÎRXISTIN: Tenê di ber destê karmendên xizmetan e.
	Haleta testê pergalê bi cih tîne. BÎRXISTIN: Belavkirina raer-binefş di haleta testê de ne pêkan e.
	Bernameya dermankirina pêş-rêxistî yan serrastkirî ya nexweş bi cih tîne.
	Hemî tîketinên li ser sefheyê betal dike û vedigerre rûpela pêşîn. Civîna dermankirinê betal dike.

Sembol	Şirove/Funksyon
	Destûr dide sîtemê da ku parametrên heyî yên dermankirinê di rûpela piştrastkirina derman bipejirîne û here qonaxa din.
	Qasa qada heyî zêde dike.
	Qasa qada heyî kêr dike.
	Derfet dide bikarhêner ku parametrên guherî yên dermankirinê di beşa pêş-rêxistina klînîkî ya pergalê hilgire. Herwiha bikarhêner derbasî rûpela birêvebirina pêş-rêxistinî ya klînîkî dike.
	Qasên pêş-rêxistinî yên klînîkî digel parametrên guherî yên derman jê dibe.
	Rûpela heyî, bêtî hilgirtin û xezinkirina rêxistinan, girêdide.
	Parametrên guherî yên derman di beşa qasên pêş-rêxistinî yên klînîkî yên pergalê xezin dike.
	Di pêvajoya hevgavkirina kontrola ji dûr ve de, îmkana ceribandina dubare ya hevgavkirina kontrola ji dûr ve dide bikarhêner.
	Dempîva îlqakirinê ya Rîboflavînê çalak bike.
	Heke hevgavkirina kontrola ji dûr ve sernekeftî be, îmkana domandina derman bêtî kontrola ji dûr ve dabîn dike.
	Piştî rêxistina hêlên hevastbûnê, ev bişkok pêvajoya derman bi raser-binefşê dest pê dike.
	Pêvajoya derman bi raser-binefşê radiwestîne. BÎRXISTIN: Ji bo her nexweşekî, du dorên rawestanê bi qasî her yek du deqe (bi giştî çar deqe) hatiye berçavgirtin.

Sembol	Şirove/Funksyon
	Derman bi raser-binefşê di heyama rawestanê ji nû ve dest pê dike.
	Rapora kurtasiya derman derdixe.
	Pêvajoya derman bêyî derxistina rapora kurtasiya derman bi dawî dihe. Bikarhêner ji rûpela rêkxistinan derdixe.
	Bikarhêner bo rûpela kurtasiya derman vedigerrîne da ku rapora kurtasiya derman derxîne.
	Îmkana bidawîanîna pêvajoya dermankirinê bêyî derxistina rapora kurtasiya dermankirinê dide bikarhêner.
	Vê derfetê dide bikarhêner ku rapora kurtasiya dermankirinê bo UBS'ya bikarhêner bişîne.

3.2. Enerjiya Raser-binefş (UV) (Doz)

“Tîrêjdana çavkaniya raser-binefş” (Doz) berhema “Şideta teyîsandinê” û “Dema teyîsandina raser-binefş” e. Doz û şideta teyîsandina raser-binefş (UV) rêkxinbar in û dema hesabkirî ji bo teyîsandina raser-binefş (UV) dihe nîşandan.

Ev pergal qasên doz, şideta teyîsandina raser-binefş, dema teyîsandina raser-binefş (UV) û dema giştî ya derman di pêvajoya dermankirinê de dişopîne.

Ev bijarde dikarin di rûpela piştrastkirina derman de bihêne guhertin. Serdana Beşa 3.8 Dermankirina Guherî bike.

Du haletên dermankirina raser-binefş, yanî “Pêvegirêdayî” û “Livbarî” bedrest e. Di haleta “Pêvegirêdayî” de, derçûyîya raser-binefş (UV) di etvahiya heyama dermankirinê de neguher e. Di haleta Pulsed (Livbarî) de, derçûyîya raser-binefş (UV) di heyamên bijartî yên bikarhêner de tê girêdan û qut dibe.

Ji bo dîtina Parametrên tevav ên dermankirinê, pêkhatî ji rêkxistina pêşbîr û bereya derman, serdana 7.2 Parametreyên Dermankirinê bike.

3.3. Beriya Çalakirina Pergalê

Beriya destpêbûna pêvajoya dermankirinê, bikarhêner divê ji duristbûna funksyona pergala KXL'ê piştrast bibe.

Ji bo misogerkirina duristiya funksyona pergale, bala xwe bide ser têbîniyên giring ên xwarê:

- Rewşa amûrê, alavên pêreyî tûlê girêdanê ji bo hebûna nivîşkaniyeke aşkira seh bike.
- Saxbûn û paqîjiya pencereya şûşeyî ya kunîleya tîrêjê seh bike. Heke pencere tûşî zirar û ziyane bûbe, nabe ku pergale bi kar bînin û divê digel 'Xizmetên Mîstêriyan' têkilî dayînin. Ji bo dîtina destûrkarên paqijkirinê sardana Beşa 4.6 bike.
- Rêzikên xwecihî yê têkildarî bikaranîna alavên bijîşkî yê gerrok ên karebayî-ronahîkî li ber çav bigire.

3.4. Amadekirina Pergalê

Pergala KXL'ê li kêleka mase yan kursiya dermankirinê bi cih bike. Ji bo bêlvîkirina mewqîya amûrê, çerxikên wê kilîl bike.

Di heyama bikaranîna pergale de, Optics head (Serikê Optîk) digel çavkaniya raser-binefs (UV) û kamerayê dûr ji ronahiya teyîser (wek mînak ronahiya gihîştî ji pencereyê) ragire.

3.5. Çalakirina Pergalê

Klîda karebayê ya girêdayî bi payeya Pergala KXL'ê, li rex girêdana tîla karebayê çalak bike. Ev veguhertin ceryana karebayê ya bidûhev digihîne Pergala KXL'ê. Teşeya xwarê bibîne.


Bişkoka rex şaşeya nîşandera KXL'ê bipelîne û berde. Teşeya xwarê bibîne. Pergala KXL'ê xeleta damezirandinê ku pêkhatî ji barkirina pergala cihêner, bicihanîna bernameyê û cihanîna testa damezirandinê ye, dest pê dibe.

BÎRXISTIN: Heke di heyama damezirandinê de çewtiyek neqewime, divê ji bo bidestxistina zanyariyên zêdetir sardana "Xîşteya Peyama Çewtiyê" li Beşa Peydakirina Nivîşkaniyên Pergalê 4.5 bike.



Teşe 7. Bişkoka çalakirinê (çep) û klîda karebayê (rast)

Di rûpela sernavê de bişkoka Start'ê (Destpêkirin) bipelîne û derbasî rûpela dermankirinê bibe.



Teşe 8. Şaşeya Sernavê

3.6. Karta Çalakkirina Derman

Karta dermankirinê derbasî qelaşa RFID'ê li aliyê çepê yê nîşanderê bike.

BÎRXISTIN: Heke kart bi duristî neyê xwendin, divê kartê ji hêla berovajî ve têxî. Kart divê teqez ji kêmî 10 çirkeyan linav qelaşê bimîne.



Teşe 9. Rûpela Têrekirina karta Derman

3.7. Piştrastkirina Derman

Piştî têrekirina karta çalakirina derman, çavê ku dikeve ber dermankirinê, hilbijêre: OS yan OD.

BÎRXISTIN: Teqez bijardeya 'eye to treated' hilbijêre, ku wisa nebe dê bişkoka Confirm'ê (Piştrastkirin) berdest nebe.

Parametrên pêşbîr ên têkildarî cûreya dermana xwarê, formûleya riboflavînê û parametrên pêşbîr ên dermankirinê di rûpela piştrastkirina dermankirinê de xuya dibin.

BÎRXISTIN: Parametrên pêşbîr ên dermankirinê û bereya tevav a parametrên dermankirinê têkildarî Pergala KXL'ê li Beşa 7.2 ya vê rêbernameyê, yanî Parametrên Dermankirinê bedrest in.

Jibo bikaranîna rêxistinên pêşbîr, bişkoka Confirm'ê (Piştrastkirin) biguvişîne da ku hevgavkirina kontrola ji dûr ve dest pê bibe. Ji bo guherandina rêxistinên dermankirinê, sardana Dermankirina Guhertî li Beşa 3.8 bike.

Treatment confirmation

4 treatments left on card

Select the eye to treat

OS OD

Treatment shape: Circle 9 mm (diameter)

Treatment type: Accelerated Epi-Off CXL (default)

Formulation: VibeX Rapid

Induction time: 10 min 0 sec

UV irradiance: 30 mW/cm²

Total UV dose: 7.2 J/cm²

UV delivery: Pulsed

Pulse duration: On 1.0 sec Off 1.0 sec

Total UV treatment time: 8 min 0 sec

Maximum number of pauses: 2

Maximum pause duration: 2 min

Cancel Save as clinic preset Confirm

Teşe 10. Şaşeya Piştrastkirina Dermankirinê

3.8. Dermankirina Guhertî

Parametrên pêşbîr ên xwarê dikarî bi guvişandina bişkokên jor (+) û jêr (-) bigherînin û brnameyeke dermankirinê ya guhertî ava bikî. Sardana Teşeya 10 bike:

- Dema Îlqakirinê (Endeksyon)
- Şideta Teyîsandinê
- Doza giştî ya Raser-binefşê
- Raberkirina raser-binefş (UV) (livbarî yan pêvegirêdayî) heke raberkirina livbarî ya raser-binefş (UV) were bijartin, heyama livbariyê jî dikare bihê rêxistin.

BÎRXISTIN: Tevî ku parameter rêkxerbar in doza giştî ya raser-binefşê li gorî sînardariyên karta çalakirina dermankirinê dihê kontrolkirin.

Piştî guherandina rêxistinên, bişkoka Confirm'ê (Piştrastkirin) bipelîne da ku hevgavkirina kontrola ji dûr ve dest pê bibe. Heke bixwazî, dikarî rêxistinên guhertî wek rêxistina pêşbîr ji bo bikaranîna din hilgirî û xezin bikî. Sardana Beşa "Qasên pêş-rêxistî" di rûpela din de bike.

Qasên pêş-rêxistî

Qasên pêş-rêxistî derfetê dide bikarhêner ku çar qasên klînîkî ji bo her cûreya dermankirinê hilgire. Ji bo hilgirtin û xezinkirina qasên pêş-rêxistî, qasa têkildar bi pelandinê hilbijêre û piştêre bişkoka Save'ê (Xezinkirin û hilgirtin) bipelîne.

Qasên pêş-rêxistî derdem dikarin bihên jêbirin.

BÎRXISTIN: Qasên pêş-rêxistî di "Şaşeya piştrastkirina dermankirinê" de li Menûya rakêşî ya cûreya dermankirinê de dihê hilgirtin û bedrest e.

Teşe 11. Hilgirtina Dermankirina Guhertî wek Qasên Pêş-rêxistî yên Klînîkî

3.9. Hevgavkirina Kontrola ji dûr ve

Piştî hilbijartina rêxistinê, bişkoka Confirm'ê (Piştrastkirin) di rûpla piştrastkirina dermankirinê de bipelîne. Pergal hevgavkirina kontrola ji dûr ve di heyama 15 çirkeyan de bi cih tîne.




Teşe 12. Rûpela hevgavkirina kontrola ji dûr ve

Jib o hevgavkirina kontrola ji dûr ve di heyameke 15-çirkeyî de, klîdên tûş û alîyan ên kontrola ji dûr ve bi kar bîne. Heke bixwazî kontrola ji dûr ve bi kar bînî, vî karî divê di her pêvajoyekê de pêk bînî.

Di vê heyama 15-çirkeyî de, Pergala KXL'ê her 2 çirkeyan carekê dike tûtetût.

Heke bişkoka hevgavkirinê ya li ser kontrola ji dûr ve di heyama 15-çirkeyî de neyê pelandin, rûpela rawestana hevgavkirina kontrola ji dûr ve xuya dibe.



Teşe 13. Rûpela Herrikbar a rawestana Hevgavkirinaa Kontrola ji dûr ve

Di rewşa qewimîna vê pîsgirêkê de, here “Nîşanderên rewşa kontrola ji dûr ve” di rûpela din de û pîsgirêkên gengaz ên bateriyê seh bike.

Bikarhêner dê du dor û nobetan ji bo hev gavkirina kontrola ji dûr ve dem û derfeta xwe hebe. Heke pêvajoya hev gavkirinê sernekeftî be, pergala derfeta domandina dermankirinê bêyî kontrola ji dûr ve an betalkirina dermankirinê dabîn dike.

GIRING: Heta bêyî kontrola ji dûr ve jî bikarhêner dikare kontrolên ser sefheyê ji bo rêxistina hevastbûna raser-binefş (UV) bi kar bîne.



Teşe 14. Kêşeya hev gavkirina kontrola ji dûr ve

Nîşanderên kontrola ji dûr ve

Kontrola ji dûr ve du çirayên nîşander hene ku hûrgiliyên rewşa kontrola ji dûr ve û bateriyê raber dikin. Çirayê bêçî-berankî (thumbpad light) li derdora sefheya bêçî-berankî û çirayê bateriyê li derdora bişkoka bateriyê çalak dibe. Heke di pêvajoya hev gavkirinê de pîsgirêkek ji bo pergala an bateriyê biqewime, dive sardana xîştaya xwarê bikî.

Nîşanderên kontrola ji dûr ve	
'Nîşandera Bêçî-berankî (Thumbpad Light)'	Têgih
Bêyî ronahiyê	Temirandî
Ronahiya şîn a zivirok	Hev gavkirin
Ronahiya şîn a neguher	Hev gav bû û amade ye
Ronahiya narincî ya neguher	Nivîşkaniya hev gavkirinê
'Nîşandera 'Çirayê Bateriyê'	Têgih
Bêyî ronahiyê	Temirandî
Ronahiya şîn a neguher	Rewşa bateriyê guncan e
Ronahiya narincî ya neguher	Baterî divê bihê guherandin
Ronahiya narincî ya çirûskî	Baterî dibê bihê guherandin (2AA)

3.10. Xwe-cerribandina hundirîn a Pergala KXL'ê

Pergala KXL'ê piştî her cara dermankirinê, pêvajoya xwe-cerribandina hundirîn ji bo piştrastkirina kalîbrasyona deqîq a UVA'yê bi cih tîne. Di pêvajoya xwe-cerribandina hundirîn de komeleke berfireh a hîskerên ronahiyê ji bo belavkirina astên deqîq ên UVA'yê ji bo her cara dermankirinê dihêne bikaranîn. Heke xwe-cerribandina hundirîn sernekeftî be, peyama çewtiyê tê dayîn û pêvajoya dermankirinê radiweste. Di vê rewşê de, divê bala xwe bidî ser peyama çewtiyê û kiryarda din anegorî xişteya peyamên çewtiyê bi cih bînin.

3.11. Amadekirina Nexweş

Nexweş divê di rewşa dest û pê azad li ser maseya dermankirinê ya kursiya derman a razayî, dirêj keve. Seriyê nexweş divê li ser paş-serî cih bigire.

Mase an kursîya dermankirinê û piştî serî rast bike ku nexweş bikaribe bêyî livandina serê xwe, di heyama dermankirinê de bi rehetî bimîne.

Bi rêya bikaranîna teknîka klînîkî ya standard, spekulumê pêlkan û ger hewce be, pêçekê bi kar bîne.


- Epithelium Off (Bê Rûpoşe): Eger pêvajoyek epithelium off (bêyî rûpoşe) were kirin, berî bikaranîna rîboflavînê, rûpoşeya reşika çav (reşika çav) rake.
- Epithelium On (Bi Rûpoşe): Eger pêvajoyek epithelium on (bi rûpoşe) were kirin, berî bikaranîna rîboflavînê, rûpoşeya reşika çav raneke.
- Lasik Xtra: Eger pêvajoyek "Lasik Xtra" were kirin, rîboflavînê rasterast piştî ablasyona leyzerê eksîmer û berî veguheztina flapa reşika çav, li ser nivîna stromaya eşkere bi kar bîne.

3.12. Enduksiyona Rîboflavînê

Bikaranîna rîboflavînê divê li gorî talîmatên bikaranîna (IFU) yê tîkildarî rîboflavînê be. Ji bo agahdariya zêdetir li ser formulasyonên rîboflavînê yê ku ji aliyê KXL'ê ve têne piştguhkirin, serî li IFU'yê ya tîkildar a rîboflavînê bide.

Amadekirina ji bo Dermankirinê


Piştî ku çavê nexweş bi sepîna destpêkê ya rîboflavînê hate amadekirin, ji bo destpêkirina enduksiyona rîboflavînê, pê li "start timer" (destpêkirina demjimêrê) bike.




Teşe 15. Ekran Amadekirina ji bo Enduksiyona Rîboflavînê

Enduksyona Rîboflavînê

Pergala KXL'ê dê di heyama enduksyonê de, ji bo sepna demkî ya rîboflavînê, rêberiya bihîstinî û dîtbarî peyda bike.



Teşe 16. Ekraana Enduksyona Pêşveçûyî



Teşe 17. Rêberiya Dîtbarî Di Heyama Enduksyona Rîboflavînê de


3.13. Xêzên Arasteyê li gel Reşika Çav a Nexweş Rêk bike

BÎRXISTIN: 60 çirke berî dawîya heyama enduksyona rîboflavînê, leyzerên sor ên arasteyê dê vebin.


Piştî ku enduksyona rîboflavînê qedîya, xêzên leyzerê yê arasteyê li gel reşika çav a nexweş rêk bike.

Serikê KXL'ê bi destan paş û pêş û çep û rast bilivîne heta ku xêzên sor ên arasteyê yê mîhwera X/Y bi navika bîbika ku dê bê dermankirin re rêk bike.

Serikê KXL'ê bi destan jor û jêr bilivîne da ku xêza sor a arasteyê ya duyem a mîhwera Z bi navika xêza sor a yekem re rêk bike.




Teşe 18. Xêzên Sor ên Arasteyê li ser Reşika Çav a Nexweş




Teşe 19. Rêkkirina Xêzên Sor ên Arasteyê

Verastkirinên rast ên li ser arasteyê dikare bi rêya bikaranîna kontrolên ji dûr ve yê bêtêl an jî bi pêlêkirina tîrên li ser ekranê were bidestxistin.



Teşe 20. Funksyonên Arasteyê yê Kontrola ji dûr ve


Eger kontrola ji dûr ve neçalak be, verastkirina rast dikare bi destan û bi rêya bikaranîna tîrên li ser ekranê (çep, rast, pêş, paş) û bişkên jor (+) û jêr (-) jî were kirin.



Teşe 21. Verastkirina Rast a li ser Ekranê

3.14. Destpêkirina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê

Bi pêlêkirina “start treatment” (destpêkirina dermankirinê), dermankirina bi tîrêja UV'yê destnîşan bike.



Teşe 22. Destpêkirina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê


Ji nexweş re bêje ku di heyama dermankirinê de bêliv bimîne û li ser xêzên sor ên arasteyê yên X û Y sekinî binêre.

 Hişyarî	
1.	Tenê piştî ku riboflavîn hate bikaranîn, dermankirinê dest pê bike.
2.	Piştirast bike ku Pergala KXL'ê û maseya an kursiya nexweş piştî arastekirinê û di heyama dermankirinê de ewle ne û nayên livandin.

 BALDARÎ	
1.	Dema ku pencereya nîşandera ronahiya UV'yê ya li ser serika optîk rengê xwe ji şîn diguherîne bo kesk, ronahiya UV'yê tê weşandin.

3.15. Çavdêriya Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê

Bi domdarî kontrol bike ku devera dermankirinê ya armanc li ser reşika çav bi ronahiya UVA'yê ronî dibe û ger hewce be, bi rêya bikaranîna kontrolên ji dûr ve yê bêtêl an jî tîrên li ser ekranê verast bike.



Teşe 23. Ekranê Dermankirina Pêşveçûyî

BÎRXISTIN: Dema ku modeya dermankirina pulsed (livokî) tê bikaranîn, ronahiya UVA'yê di heyamên "OFF" (girtî) de nayê dîtin. Di van dewranan de, înterfeysa operatorê naguhêre "Ronahiya UV'yê: OFF (Girtî)".


3.16. Rawestandina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê

Heke hewce be ku dermankirina bi tîrêja UV'yê bê rawestandî, Pergala KXL'ê destûr dide du rawestan. Her rawestek dikare heya du deqeyan bidome.


Li ser ekrana "Treatment paused" (dermankirin hate rawestandî), li Wêne 24'ê binêre, hejmara dema rawestanê kêr dibe û barek dema borî nîşan dide. Di dema rawestanê de deng jî tê bîhîstin.

Dema ku wextê mayî digihêje 30 çirkeyan, bar ji kesk diguherîne sor. Di wextê diyarkirî de, pê li "Resume Treatment" (berdewamkirina dermankirinê) bike ji bo vegerandina dermankirina xwe. Dema tu dermankirinê ji nû ve bidomîni, rawestan xelas dibe.

GIRING: Eger di wextê diyarkirî de tu pê li "Resume Treatment" (berdewamkirina dermankirinê) nekî, hemû rawestan xelas dibin. Divê tu dermankirinê betal bikî, hetta ev yek li ser rawesta yekem jî qewimibe.




Hişyariya
30-çirkeyî



Teşe 24. Rawestandina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê

Piştî ku rawestan xelas bûn, ji bo bidawîkirina dermankirinê pê li “Cancel” (betal) bike.




Teşe 25. Rawestanên Dermankirinê Xelas Bûn

3.17. Betalkirina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê ya Pêşveçûyî

Di her kêliyê de di dema dermankirina bi tîrêja UV'yê ya pêşveçûyî de, dermankirin dikare bihê betalkirin.

Ji ekrana 'Treatment in progress' (dermankirin pêşve diçe) pê li “Pause” (rawestandin) bike, û dûvre ji ekrana 'Treatment Paused' (dermankirin hate rawestandin) pê li “Cancel” (betal) bike.

Dûvre, pencereyek pop-up a hişyariyê dê derkeve holê, ku piştrast dike ku bikarhêner dixwaze dermankirinê betal bike.



Teşe 26. Betalkirina Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê ya Pêşveçûyî

3.18. Dermankirina Bi Tîrêja UV'yê ya Temambûyî

Piştî ku dermankirina bi tîrêja UV'yê qediya, pergala dê kurteya dermankirinê nîşan bide.

Treatment ID: 2023-0921-1400-0001 00:18:45

Treatment summary

Treatment type: Accelerated Epi-off CXL

Status:	Complete ✓
Treated Eye:	OS
Treatment Shape:	Circle 9 mm (diameter)
Total UV dose	
Delivered:	7.2 J/cm ² ✓
Target:	7.2 J/cm ²
Total UV treatment time	
Completed:	8 min 0 sec ✓
Target:	8 min 0 sec
Total elapsed time:	18 min 45 sec

Export report Done



Teşe 27. Ekrana Kurteya Dermankirina Temambûyî

BÎRXISTIN: Dermankirinê betalbûyî/nekemilî jî dê di kurteya dermankirinê de werin nîşandan.


Treatment ID: 2023-0925-0842-0500 00:03:05

Treatment summary

Treatment type: Lasik Xtra

Status:	Not completed ✗
Treated Eye:	OD
Treatment Shape:	Circle 9 mm (diameter)
Total UV dose	
Delivered:	2.4 J/cm ² ✗
Target:	2.7 J/cm ²
Total UV treatment time	
Completed:	1 min 0 sec ✗
Target:	1 min 30 sec
Total elapsed time:	3 min 05 sec

Export report Done




Teşe 28. Ekrana Kurteya Dermankirina Nekemilî


3.19. Derxistina Rapora Kurteya Dermankirinê

Raporên kurteya dermankirinê dikarin ji Pergala KXL'ê li ser USB'yek ku ji aliyê mişterî ve hatiye peydakirin, bên derxistin.

- Li ser ekrana kurteya dermankirinê, pê li “export report” (derxistina raporê) bike.
- Li ser ekrana pop-up, pê li “export” (derxistin) bike.
- USB'ya ku ji aliyê mişterî ve hatiye peydakirin, têxe.




Teşe 29. Derxistina Rapora Dermankirinê bo USB'yê



Teşe 30. Têxistina Ajokera USB'yê ji bo Derxistina Raporê

Dermankirin dikare bêyî derxistina rapora kurteya dermankirinê jî bêne temankirin.

BÎRXISTIN: Bikarhêner dikarin dermankirinê bêyî derxistina rapora kurteya dermankirinê, bi pêlêkirina “done” (qediya) ji ekrana kurteya dermankirinê û dîvre piştrastkirina bijartinê, bidawî bikin.



Teşe 31. Temankirina Dermankirinê Bêyî Derxistina Rapora Dermankirinê

3.20. Temirandinaa Pergala KXL'ê


Piştî ku dermankirin qediya, pergala dê vegere ekrana sernavê.

Ji bo temirandinaa Pergala KXL'ê, pê li “power off” (temirandina) bike.



Teşe 32. Temirandina ji Ekrana Sernavê

Ji bo piştrastkirina temirandina pergale, pê li “yes” (erê) bike.



Teşe 33. Piştrastkirina Temirandina Pergala KXL'ê

Bisekine heta ku nermalav biqede û ekran vala bibe.


Guhestoka elektrîkê ya sereke li ser bingeha KXL'ê bizivîrîne pozîsyona off (girtî).



Teşe 34. Guhestoka Elektrîkê ya Sereke di Pozîsyona Girtî de

3.21. Menûya Vebijêrkan

Ji ekrana sernavê ya sereke ve, hin rêxistinên pergalê yê zêde hene ku dikarin bîn bidestxistin. Ji bo gihîştina Menûya Vebijêrkan, pê li “options” (vebijêrk) bike. Ji menûya vebijêrkan sê vebijêrk berdest in:




Teşe 35. Menûya Vebijêrkan

- System Settings (Rêxistinên Pergalê): Pênc rêxistinên pergalê hene ku dikarin li gorî tercîhên bikarhêner bîn verastkirin.
- Service Settings (Rêxistinên Servîsê): Tenê ji bo bikaranîna Glaukos û karmendên servîsê ye û pêdivî bi karta gihîştina servîsê heye.
- Demo Mode (Moda Demo): Destûr dide perwerdehiya bikarhêner li ser pergalê bêyî karanîna ronahiya UV'yê an kartên dermankirinê.

3.22. Menûya Rêxistinên Pergalê

Li jêr vebijêrk û funksyonên menûya rêxistinên pergalê hene.



Teşe 36. Rêxistinên Pergalê

- Audio volume (Bilindahiya Deng): Destûr dide verastkirina asta dengê pergalê.
- Camera white balance (Hevsengiya spî ya kamerayê): Destûr dide hilbijartina ronahiyê di navbera sê rêxistinên de: Tungsten 2800K (pêşbîr), Ronahiya Rojê 5000K an Ronahiya Rojê 6500K
- System language (Zimanê pergalê): Destûr dide bikarhêner ku înterfeysa bikarhêner ji Îngilîzî biguherîne yek ji pênc zimanan.
- Export service log (Derxistina qeyda servîsê): Destûr dide bikarhêner ku qeydên servîsê li ser USB'yê derxîne (nehatiye peydakirin).
- Alignment crosshairs intensity (Tundiya xêzên arasteyê): Destûr dide verastkirina ronahiya xêzên arasteyê.

4. LÊNERRÎNÎ / SERVÎS

Pênase	
Maintenance (Lênêrînî)	Lênêrînî behsa wan prosedurên ne-teknîkî dike ku pêdivî ye operatorê rojane ji bo domandina xebata rast a pergalê pêk bîne.
Service (Servîs)	Servîs behsa karên ku tenê ji hêla nûnerek servîsê ya jêhatî ve têne kirin, dike.

4.1. Polîtîkaya Sazkirinê

Ji bo her mişteriyek nû ya Pergala KXL'ê, personelek perwerdekirî/rayedar a Glaukos'ê pergalê saz dike û vedike, û piştrast dike ku pergal bi rêkûpêk dixebite. Her verastkirinek din a hişkalavê, ji bilî ya ku ji bo xebata normal hatî destnîşan kirin, divê ji aliyê belavkerek rayedar a Glaukos'ê ve, an jî bi rêberiya wî were kirin.

4.2. Lênêrîniya Bikarhêner

Bi lûnêrîn û servîsa birêkûpêk, temenê bendewar ê amûrê heft sal e.

Lênêrîna birêkûpêk dê bibe alîkar ku Pergala KXL'ê û funksyona wê were parastin. Lûnêrîna jêrîn a bikarhêner tê pêşniyazkirin.

Berî her dermankirinê:

- Amûr, aksesûar û kabloyên girêdanê û kabloya elektrîkê ji bo zirara xuya kontrol bike; heke zirar lê bûbe, bi kar neyîne.
- Saxbûn û paqijîya pencereya şûzeyî ya kunîleya tîrêjê seh bike. Heke pencere tûşî zirar û zîyanê bûbe, nabe ku pergalê bi kar bînin û divê digel 'Xizmetên Mişterîyan' têkilî dayînin. Ji bo dîtina destûrkarên paqijkirinê sardana Beşa 4.6 bike.

Bi awayê peryodîk Pergala KXL'ê kontrol bike û heke hewce be, rûberan li gorî talîmatên di beşa 4.6 de paqij bike.

4.3. Agahdariya Garantiyê

Garantî bi awayekî cuda bi agahdariya kirîne re tê peyda kirin.

4.4. Agahdariya Peymana Servîsê

Ji bo Pergala KXL'ê dibe ku peymanek servîsê peyda bibe. Ji bo vebijarkên ku li herêma te peyda dibin, têkiliyê bi firoşkar an nûnerê rayedar ê herêmî yê Glaukos'ê re dayîne. Di heyama peymana servîsê de, divê hemî servîs ji aliyê nûnerek servîsê ya jêhatî ve bêne kirin. Heke pergal te bi pîrsgirêkekê re rû bi rû ma, ji bo gavên çareseriyê yê gengaz, serî li beşa 4.5 ya Çareserkirina Pîrsgirêkên Pergalê bide.

4.5. Çareserkirina Pîrsgirêkên Pergalê

System Errors (Çewtiyên Pergalê)

Pergala KXL'ê di destpêka vebûnê de rewşa xwe otomatîkî kontrol dike. Eger rewş ne rast be, nermalav nahêle ku operator dermankirinê dest pê bike.

Di bûyera çewtiyek pergalê de, ji kerema xwe serî li Tabloya Peyamên Çewtiyê bide ku pêrista çewtiyan, sedem û çalakiya ku ji bo çareserkirina çewtiyê hewce ye, lîsteyê dike.

Heke di dema xebitandina Pergala KXL'ê de tu bi zehmetiyek din a ku nayê çareserkirin re rû bi rû mayî, ji kerema xwe têkiliyê bi nûnerê rayedar ê herêmî yê Glaukos'ê re dayîne.

Error Message Table (Tabloya Peyamên Çewtiyê)			
Hej.	Çewtî	Sedem	Çalakî
1	UNKNOWN_ERROR (ÇEWTÎYA_NENAS)	Birêvebirê îstîsnayê yê giştî yê nehatiye birêvebirin	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
2	SYSTEM_SETTINGS_COULD_NOT_BE_SAVED (RÊKXISTINA_SÎSTEMÊ_NIKARE_BIHÊ_HILGIRTIN)	Çewtiya têketin/derketina pelê	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
3	VALID_CALIBRATION_DATA_NOT_FOUND (KALÎBRASYONA_DERBASDAR_A_DATAYÊ_NEHAT_PEYDAKIRIN)	Xerabûna pelê	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
4	REQUEST_TO_PRIMARY_BOARD_TIMED_OUT (DAXWAZA_BOARDA_SERETAYÎ_EKSPAYÎR_BÛYE)	Wendabûna ragihandinê	Pergalê ji nû ve dest pê bike; heke çewtî berdewam bike, têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
5	COULD_NOT_CONTROL_ALIGNMENT_LASERS (BICÎBÛNA_LAZERAN_NIKARE_WERE_KONTROLKIRIN)	Xerabûna (HW)	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
6	ERROR_IN_UPDATE_TREATMENTCARDUSAGE (ÇEWTÎ_DI_BIROJKIRINA_BIKARANÎNA_KARTA_TERAPÎYÊ)	Çewtiya ragihandinê bi etîketa RFID'yê re	Kartek din bi kar bîne; heke berdewam bike, têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
7	NOT_SAME_CARD_MESSAGE (NE_HEMAN_PEYAMA_KARTÊ)	Di navbera piştrastkirina dermankirinê û enduksyonê de, kart hate guherandin	Karta ku dermankirinê pê destpê kiribû, bi kar bîne.
8	SYSTEM_ERROR (ÇEWTÎYA_SÎSTEMÊ)	Îstîsnaya birêvebûyî	Pergalê ji nû ve dest pê bike, heke çewtî berdewam bike têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
9	UV_TREATMENT_COULD_NOT_BE_STARTED (TERAPÎYA_UV'YÊ_NIKARE_WERE_DESTPÊKIRIN)	Destpêkirina dermankirinê ji hêla FW'yê ve hate red kirin	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
10	UV_COULD_NOT_BE_PAUSED (UV_NIKARE_WERE_RAWESTANDIN)	Ferman rawestandîna ji hêla FW'yê ve hate red kirin	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
11	TREATMENT_COULD_NOT_BE_COMPLETED (TERAPÎ_NIKARE_WERE_TEVAVKIRIN)	Ferman temamkirina dermankirinê ji hêla FW'yê ve hate red kirin	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
12	Packet reception failed (Wergirtina pakêta tîk çû)	Wendabûna ragihandinê	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
13	Packet transmit failed (Şandina pakêta tîk çû)	Wendabûna ragihandinê	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne

Error Message Table (Tabloya Peyamên Çewtiyê)			
Hej.	Çewtî	Sedem	Çalakî
14	SYSTEM_CONNECTION_HAS_BEEN_LOST_DURING_TREATMENT_TREATMENT_HAS_BEEN_HALTED (GIRÊDANA_SÎSTEMÊ_DI_HEYAMA_TERAPÎYÊ_DE_WINDA_BÛYE_TERAPÎ_HATÎYE_SEKINANIN)	Wendabûna ragihandinê	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
15	SYSTEM_FAILED_TO_CONNECT_WITH_DEVICE (SÎSTEM_DI_GIRÊDANA_DIGEL_AMÛRÊ_DE_TÊK_ÇÛ)	Wendabûna ragihandinê	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
16	ERROR_UVMON_PD1_H (ÇEWTÎ_UVMON_PD1_h)	PD1 ji nirxa kalîbrasyonê ya armanc ji sedî 10 zêdetir e	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
17	ERROR_UVMON_PD1_L (ÇEWTÎ_UVMON_PD_L)	PD1 ji nirxa kalîbrasyonê ya armanc ji sedî 10 kêmtir e	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
18	ERROR_UVMON_TRMT_TIME_H (ÇEWTÎ_UVMON_TRMT_TIME_h)	Dermankirinê ji wextê payî ji 3 çirkeyan zêdetir derbas kir	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
19	ERROR_UVMON_TRMT_TIME_L (ÇEWTÎ_UVMON_TRMT_TIME_L)	Dermankirin ji wextê payî 3 çirkeyan zûtir qediya	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
20	ERROR_UVMON_OVERTEMP (ÇEWTÎ_UVMON_OVERTEMP)	Germahiya dioda UV'yê ji 50 pileyî S ed. zêdetir e	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
21	ERROR_UVMON_PD2_H (ÇEWTÎ_UVMON_PD2_H)	PD2 ji nirxa kalîbrasyonê ya armanc ji sedî 10 zêdetir e	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
22	ERROR_UVMON_PD2_L (ÇEWTÎ_UVMON_PD2_L)	PD2 ji nirxa kalîbrasyonê ya armanc ji sedî 10 kêmtir e	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
23	ERROR_WATCHDOG_FAILURE (ÇEWTÎ_TÊKÇÛNA_WATCHDOG)	Çavdêrê UV'yê (Watchdog) ket hereketê.	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
24	ERROR_DTR_DISABLED_UNEXPECTEDLY (ÇEWTÎ_BÊŞIYANBÛNA_ÇAVERÊNEKIRÎ_YA_DTP)	DTR neçalak bû.	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
25	ERROR_UV_DISABLED_BY_FW_UNEXPECTEDLY (ÇEWTÎ_UV_BÊŞIYANKIRÎ_BI_FW_YA_ÇAVERÊNEKIRÎ)	UV ji hêla firmware ve ji nişka ve hate neçalak kirin	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
26	SELFTEST_FAILED_UV_DTR_ERROR (ÇEWTÎYA_DTR_UV_TÊKÇÛYÎ_YA_XWETESTKER)	UV ji hêla UIC'yê ve bi rêya sînyala DTR'yê nehate çalak kirin.	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne

Error Message Table (Tabloya Peyamên Çewtiyê)			
Hej.	Çewtî	Sedem	Çalakî
27	SELFTEST_FAILED UV_WATCHDOG (WATCHDOG'A_UV'YA_ TÊKÇÛYÎ_YA_XWETESTKIRÎ)	Hişkalava çavdêr (watchdog) nehate çalakkirin.	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
28	SELFTEST_FAILED UV_CALIBRATION_ CHECKSUM_ERROR (ÇEWÎYA_CHECKSUM'A_ KALÎBRASYONA_UV_YA_ TÊKÇÛYÎ_YA_XWETESTKIRÎ)	Kontrola CRC'ya kalîbrasyonê têk çû, ku destnîşan dike ku dibe danê xerabûbe	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
29	SELFTEST_FAILED UV_OUT_OF_RANGE (UV'YA_TÊKÇÛYÎ_YA_ XWETESTKIRÎ_YA_ DERVEYÎ_BEREYÊ)	PD1'yê destnîşan kir ku UV di dema ceribandînê de ji rêjeya +/-10% derbas bû.	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne
30	SELFTEST_FAILED MOTION_CONTROL_ MOTOR_ERROR (ÇEWÎYA_MATORA_ KONTROLÊ_LEBATA TÊKÇÛYÎ_YA_XWETESTKIRÎ)	Motorên 3-teşeyî nekarîn bèn cîhkirin (home).	Têkiliyê bi belavkar an karûbarê mişteriyê xwe re dayîne

BÎRXISTIN: Heke tu bi zehmetiyekê re rû bi rû mayî ku bi çalakiyên pêşniyazkirî yên di vê tabloyê de neyê çareserkerin, ji kerema xwe têkiliyê bi nûnerê rayedar ê herêmî yê Glaukos'ê re dayîne

Guhertina Bateriyên Kontrola ji dûr ve ya Bêtel

Pergala KXL'ê kontrolên ji dûr ve yê bi bateriyên guherînbar bi kar tîne. Ji bo guhertina bateriyên di kontrolên ji dûr ve de, pêşiya kontrolê bi destê xwe bigire û ber bi paş ve bikişîne, di heman demê de paşiya kontrolê jî bigire û ber bi aliyê berevajî ve bikişîne. Li Teşe 37 binêre.

Eger kontrola ji dûr a kevin bi kar tînî, serî li Pêveka 1'ê bide.




Teşe 37. Gihîştina Parçeya Bateriyê

Çareserkirina Pirsgirêkên Girêdana Kontrola ji dûr ve


Eger kontrola ji dûr a kevin bi kar tînî, serî li Pêveka 1'ê bide.

Eger baterî qels bibin, pergala dê girêdana xwe bi kontrola ji dûr ve winda bike. Ji bo ku kontrola ji dûr ve dîsa hevgav bibe, pê li "OK" bike.



Teşe 38. Derbaskirina Dema Hevgavkirina Kontrolê

Heke hevgavkirina kontrolê piştî du ceribandinan jî bi ser nekeve, ji bo temamkirina dermankirinê bêyî kontrolê, pê li "continue" (berdewam) bike.



Teşe 39. Hevgavkirina Kontrolê Bi Serneketî

4.6. Paqijkirina Pergalê

Berî paqijkirinê, piştrast bike ku pergal vemirî ye û kabloya elektrîkê ya sereke jê veqetiyaye. Tê pêşniyazkirin ku pergal û pêkhate bi vî awayî bên paqijkirin.

Pergala KXL'ê: Ji bo paqijkirina pergalê, destmalek bê rîşik a bi elkola îsopropîl hênikkirî bi kar bîne. Dema ku tu rûyê amûrê paqij dikî, bala xwe bide ku şilemeniyên paqijkirinê nekevin nav amûrê, ji ber ku ev yek dikare zirarê bide amûrê.

Kontrola ji dûr ve: Ji bo paqijkirina kontrola ji dûr ve, destmalek bê rîşik a bi elkola îsopropîl hênikkirî bi kar bîne.

Ji bo paqijkirina kunîleyê, serî li Beşa 4.7 bide.

Pergalê di nav şilemeniyê de binav neke û şilemeniyê li ser pergalê NERIJÎNE.

Tu pêkhateyên Pergala KXL'ê ji bo ku ji aliyê operatorê ve bên sterilîzekirin nehatine çêkirin.

 BALDARÎ	
1.	Berî her prosedûra paqijkirinê, pergalê vemirîne û kabloya dabînkirina elektrîkê ji dergeha sereke derxe.
2.	Pencereya cama kunîleya tîrêjê divê di tu rewşê de bikeve têkiliya paqijkerên êrîşkar.

4.7. Paqijkirina Kunîleyê


Berî dermankirinê, yekparebûn û paqijiya pencereya cama kunîleya tîrêjê kontrol bike. Heke zirar lê bûbe, bi kar neyîne.

Eger paqijkirin hewce be, rûyê camê yê kunîleyê bi destmaleke lensa kamerayê an jî bi hewayê pêçayî paqij bike da ku qirêj ji kunîleyê rake.

4.8. Verastkirina Baskê Movikdar


Heger baskê movikdar serika optîk di rewşek rast a stabîl de negire, ji bo hevsengkirina baskê, gavên li jêr bişopîne.

Baskê di tevahiya qada livîna xwe de jor û jêr bixe û baskê bi awayekî asoyî, ango bi qasî paralel bi erdê re, saz bike.




Teşe 40. Baskê Paralel bi Erdê re Saz bike

Eger bask ber bi jêr ve bişemite, baskê rake heta serê qada xwe û bi zivirandina pêça, bi kêmfî ve nîvek zivirandinê, Pêça Hevsengkirinê A sist bike. Ji bo vê yekê, Allen Wrench a 3/32" ya dabînkirî bi kar bîne. Li Wêne 41 binêre.



Teşe 41. Pêça Hevsengkirinê A sist bike

Baskê ji nû ve bi awayekî asoyî saz bike. Pêça Hevsengkirinê ya jorîn B bi zivirandina pêça, bi kêmfî ve nîvek zivirandinê, sist bike. Ji bo vê yekê, Aleya Allen a 3/32" ya peydakirî bi kar bîne. Li Wêne 42 binêre.




Teşe 42. Pêça Hevsengkirinê B sist bike

Bi piştgirîkirina bargiraniyê, rewşa asoyî ya baskê heke hewce be biparêze.

Bi rêya bikaranîna Aleya Allen a 7/32" ya ku bi pergale re hatiye peydakirin, bi Pêça Rêzkirina Hêzê C, tansyona baskê saz bike. Pêça C'ê berevajiyê zivirîna demjimêrê (counterclockwise) bizivirîne heta ku bask dest bi livîna hêdî ber bi jor ve bike. Piştî verastkirinê, dema ku bask bi sivikî ber bi jêr ve tê lêdan, divê piçekî paşve bizivire. Li Wêne 43 binêre.

BÎRXISTIN: Dibe ku 15-20 zivirandin hewce bibin. Eger bask berdewam bike ku ber bi jêr ve bişemite û pêç neyê zivirandin, têkiliyê bi nûnerê servîsê yê herêmî yê Glaukos'ê re dayîne.



Teşe 43. Bi Pêça Rêzkirina Hêzê C Tansyona Baskê saz bike

Pêça Rêzkirina Hêzê C di rêça zivirîna demjimêrê de du zivirandinên tije bizivirîne.

Piştirast bike ku bask bi zorê ber bi jor ve diçe, ango hema hema di cihê xwe de disekine.

Baskê rake heta asta herî bilind û Pêça Hevsengkirinê A'ê heta ku têkilî çêbibe teng bike, paşê bi qasî ½ heta ¾ zivirandinên herî zêde teng bike. Li Wêne 41 binêre.

Baskê bi awayekî asoyî saz bike û Pêça Hevsengkirinê B'ê heta ku têkilî çêbibe teng bike, paşê bi qasî ½ heta ¾ zivirandinan teng bike. Li Wêne 42 binêre.

Baskê di tevahiya qada livîna xwe de jor û jêr bixe. Piştirast bike ku livîneke ber bi jor an jêr ve çênebe. BÎRXISTIN: Eger bask ji her rewşekê ber bi jor ve bişemite, wê vegere rewşa asoyî û Pêça Rêzkirina Hêzê C'ê bi qasî ¼ zivirandinê di her carê de, li gorî zivirîna demjimêrê (clockwise) bizivirîne heta ku êdî bi serê xwe ranebe.

4.9. Livandina Pergalê

Pergala KXL'ê wekî pergalek livok a di nav hawîrdorek nivîsgehê de hatiye çêkirin.

GIRING: Heke ji her sedemekê veguhastin an barkirina pergale hewce be, têkiliyê bi nûnerê xwe yê herêmî yê Glaukos'ê re dayîne. Pêçandin û veguhastina pergale divê tenê ji hêla personelên perwerdekirî û rayedar ên Glaukos'ê ve were kirin.

Berî ku pergale ji jûreyekê bigerî nî yekî din, divê serî li nêzî destikê erebaneyê were danîn, bi vî awayî ku enîşk li paş ve derkeve. Ji bo sazkirinê, li Wêne 44 binêre. Pergal bi hêsanî bi destikê erebaneyê dikare ji çarçoveya derî were xistin.



Teşe 44. Veavakirina Pergalê ji bo Livandin û Embarkirinê

4.10. Embarkirina Pergalê

Pergalê bi heman awayê ku di beşa 4.9 de ji bo livandinê hatiye destnîşankirin, embarke bike. Hemî taybetmendiyan germahî û şiliyê yê embarkirinê yê ku di Beşa 7 de hatine lîstekirin bişopîne: Taybetmendî.

Tu parçeyek ji pergalê ji hev veqetîne, ji ber ku ev yek dikare bibe sedema şaş arastebûnê an zirarê.

Hemî pêkhatayan VEMIRÎNE û guhestoka elektrîkê ya sereke bigre. Kabloya elektrîkê ji dergeha elektrîkê derxe. Eger pergal ji bo demeke dirêj were embarkirin, bateriyan ji kontrola ji dûr a bêtêl derxe.

4.11. Nermalav

Heke nermalav xera bibe û tîk biçe, gazî nûnerê servîsê yê herêmî yê Glaukos'ê bike. Nûvekirinên nermalavê dê tenê ji aliyê nûnerên servîsê yê Glaukos'ê ve bên kirin.

4.12. Rîskên Têkildarî Avêtina Hilberên Zevî

Dema ku tu hilberên zevî davêjî, hemî rêzikên herêmî yê sepîner bişopîne.

5. DESTEBENDÎYA CÎHAZAN BIKE

5.1. Li gorî EN60601-1 Standarda Elektrîkî ya Amûrên Bijîşkî

Parastina li hember şoka elektrîkê

- Rêza 1 (çavkaniya elektrîkê ya derveyî)

Asta parastina li hember şoka elektrîkê

- Nehatiye sinifandin, amûr bi parçeya sepîner re nehatiye peydakirin
- Parastina pergale ya li hember têketina tiştan û avê (Ingress protection): IP20 (Bêyî parastina li hember têketina avê)
- Parastina nûvekirî ya kontrola ji dûr ve li hember têketinê: IP53

Rêbaza sterilîzekirinê an dezenfektekirinê

- Amûra ku dikare bê dezenfektekirin

Asta parastina ji bo bikaranînê di hebûna tevliheviyeke şewitbar a hewayî de

- Bêyî parastin

Şertên bikaranînê

- Xizmeta berdewam

5.2. Li gorî FCC Beşa 15, EN55011 û EN60601-1-2

Rêza B

5.3. Li gorî EN60825-1 Ewlehiya Hilberên Lazerê

Lazerên arasteyê Hilberên Lazera Rêza 1 in

5.4. Li gorî EN62471 Ewlehiya Biyofotobiyolojîk ya Lamba û Pergalên Lambayê

IEC 62471:2006 Koma Rîskê 2

EN 62471:2008 Koma Rîskê 3

5.5. Li gorî Pêveka II.3 ya Rêbernameya 93/42/EEC

Rêza IIa

5.6. Pêwîstiyên EMC'yê



Pergala KXL'ê ji bo lihevhatina elektromanyetîkî (EMC) pêdivî bi tedbîrên taybet heye. Amûr divê li gorî zanyariyên EMC'yê yên nivîsandî di vê rêbernameyê de bihê sazîkirin û bikarxistin. Dibe ku alavên ragihandinê yên RF'ê yên hilgirbar û livok bandorê li Pergala KXL'ê bikin.

Rêbername û daxuyaniya hilberîner - emîsyonên elektromanyetîkî		
Pergala KXL'ê ji bo bikaranînê di hawîrdora elektromanyetîkî ya li jêr hatî destnîşankirin de hatiye çêkirin.		
Divê mişterî an bikarhênerê Pergala KXL'ê piştrast bike ku ew di hawîrdorek wisa de tê bikaranîn.		
Testa emîsyonê	Lihevhatin	Hawîrdora elektromanyetîkî — rêbername
Asta tengasiya guhêzbar (Emîsyonên guhêzbar) CISPR 11 EN55011	Kom 1	Pergala KXL'ê enerjiya RF'yê tenê ji bo funksyona xwe ya navxweyî bi kar tîne. Ji ber vê yekê, emîsyonên wê yên RF'yê pir kêmtir in û ne mimkûn e ku bibin sedema astengiyê li alavên elektronîkî yên nêzîk.
Asta tengasiya tîrêja elektromanyetîkî (Emîsyonên tîrêjkirî) CISPR 11 EN55011	Rêza B	Pergala KXL'ê ji bo bikaranînê li hemû cihan, di nav de cihên nişteciybûnê û yên ku rasterast bi tora giştî ya dabînkirina elektrîkê ya kêmtir-voltajê ve girêdayî ne ku avahiyên ji bo armancên nişteciybûnê dabîn dike, maqûl e. HIŞYARÎ: Taybetmendiyên emîsyonê yên vê alavê wê ji bo bikaranînê li deverên pişesazî û nexweşxaneyan (CISPR 11 rêza A) maqûl dike. Eger ew li hawîrdoreke nişteciybûnê (ku ji bo wê bi gelemperî CISPR 11 rêza B hewce ye) were bikaranîn, dibe ku ev alav parastina têr ji karûbarên ragihandina radyo-frekansê re peyda neke. Dibe ku bikarhêner hewce bike ku tedbîrên kêmkirinê bigire, wek mînak cîh an rêça alavê biguherîne.
Emîsyonên herika harmonîk IEC 61000-3-2	Rêza A	
Guherîna voltajê, daliran / emîsyonên çirûskê IEC 61000-3-3	Lihev dike	

Rêbername û daxuyaniya hilberîner - parastina elektromanyetîkî			
Pergala KXL'ê ji bo bikaranînê di hawîrdora elektromanyetîkî ya li jêr hatî destnîşankirin de hatiye çêkirin. Divê mişterî an bikarhênerê Pergala KXL'ê piştrast bike ku ew di hawîrdorek wisa de tê bikaranîn.			
Testa parastinê	Asta testa IEC 60601	Asta lihevhatinê	Hawîrdora elektromanyetîkî — rêbername
Derkirina elektrostatik (ESD) IEC 61000-4-2	+/- 8 kV têkilî +/- 15 kV hewa	+/- 8 kV têkilî +/- 15 kV hewa	Divê erd ji dar, beton, an pîleya seramîk be. Eger erd bi materyalê sentetîk ve hatibe pêçandin, divê şilbûna têkildar bi kêmî ve %30 be.
Derbasbûna elektrîkî ya lezgîn/teqîn IEC 61000-4-4	Frekansa Dubarekirinê 100Khz +/- 2 kV ji bo xetên dabînkirina elektrîkê û +/- 1 kV ji bo xetên têtetînê/derketinê	+/- 2 kV ji bo xetên dabînkirina elektrîkê Ne sepîner Xetên Têketinê / Derketinê	Divê kalîteya elektrîka sereke ya hawîrdorek bazirganî an nexweşxaneyê ya tîpîk be.
Pêla voltajê (Surge) IEC 61000-4-5	+/- 1 kV xet bi xet +/- 2 kV xet bi erdê	+/- 1 kV xet bi xet +/- 2 kV xet bi erdê	Divê kalîteya elektrîka sereke ya hawîrdorek bazirganî an nexweşxaneyê ya tîpîk be.
Daketina voltajê, qutbûnên kurt, û guherînên voltajê li ser xetên têtetîna dabînkirina elektrîkê IEC 61000-4-11	0 % UT (%100 daketin di UT de) ji bo 0.5 dewran 0 % UT (%100 daketin di UT de) ji bo 1 dewran 70 % UT (%30 daketin di UT de) ji bo 25/30 dewran 0 % UT (%100 daketin di UT de) ji bo 5 çirkeyan. Ji bo 0.5 li her goşeya qonaxê 0-315 ku bi 45'ê ve hatine veqetandin	0 % UT (%100 daketin di UT de) ji bo 0.5 dewran 0 % UT (%100 daketin di UT de) ji bo 1 dewran 70 % UT (%30 daketin di UT de) ji bo 25/30 dewran 0 % UT (%100 daketin di UT de) ji bo 5 çirkeyan. Ji bo 0.5 li her goşeya qonaxê 0-315 ku bi 45'ê ve hatine veqetandin	Divê kalîteya elektrîka sereke ya hawîrdorek bazirganî an nexweşxaneyê ya tîpîk be. Heke bikarhênerê Pergala KXL'ê di dema qutbûnên elektrîka sereke de xebata domdar hewce bike, tê pêşniyazkirin ku Pergala KXL'ê ji dabînkerek elektrîkê ya bînavber (UPS) an jî bataryayê were xwedîkirin.
Meydana magnetîkî ya frekansa elektrîkê (50/60 Hz) IEC 61000-4-8	30 A/m	30 A/m	Divê meydanên magnetîkî yên frekansa elektrîkê di astên taybetmendiya cîhekî tîpîk di hawîrdorek bazirganî an nexweşxaneyê ya tîpîk de bin.
Meydanên Magnetîkî yên Nêzîkbûnê IEC 61000-4-39	9KHz-150Khz, 150Khz-26MHz	9KHz-150Khz, 150Khz-26MHz	Divê meydanên magnetîkî yên nêzîkbûnê di astên taybetmendiya cîhekî tîpîk di hawîrdorek bazirganî an nexweşxaneyê ya tîpîk de bin.
BÎRXISTIN: UT voltaja elektrîka sereke ya AC'yê ye berî sepandina asta testê.			

Rêbername û daxuyaniya hilberîner - parastina elektromanyetîkî			
Pergala KXL'ê ji bo bikaranînê di hawîrdora elektromanyetîkî ya li jêr hatî destnîşankirin de hatiye çêkirin. Divê mişterî an bikarhênerê Pergala KXL'ê piştrast bike ku ew di hawîrdorek wisa de tê bikaranîn.			
Testa parastinê	Asta testa IEC 60601	Asta lihevhatinê	Hawîrdora elektromanyetîkî — rêbername
Asta tengasiya guhêzbar a ku ji hêla meydana RF'yê ve hatiye çêkirin (Asta Tengasiya Guhêzbar) IEC61000-4-6	3 Vrms 150 kHz heta 80 MHz zêdeyî 6Vrms ji bo bendên ISM'yê	3Vrms	Divê alavên ragihandinê yên RF'ê yên hilgirbar û livok ji her parçeyek Pergala KXL'ê, di nav de kabloyan, ji dûrahiya veqetandinê ya pêşniyazkirî ku ji hev kêşeya sepîner ji bo frekansa veguhezkarê hatiye hesibandin, nêzîktir neyên bikaranîn. Dûrahiya veqetandinê ya pêşniyazkirî. $d = 1,2\sqrt{P}$ 80 MHz heta 800 MHz $d = 1,2\sqrt{P}$
Meydana Elektromanyetîkî ya RF ya Tîrêjkirî IEC 61000-4-3 Meydanên nêzîkbûnê yên ji alavên ragihandinê yên bêtêl ên RF'yê (IEC 60601-1-2 Tablo 9)	3 V/m 80 MHz heta 2.7 GHz 15 frekansên taybetî. Asta parastinê 9-28V/m	3 V/m 15 frekansên taybetî. Asta parastinê 9-28V/m	$d = 1,2\sqrt{P}$ $d = 2,3\sqrt{P}$ 80 MHz heta 2.7 GHz ku P asta herî zêde ya hêza derketinê ya veguhezkarê bi watt (W) ye li gorî hilberînerê veguhezkar, û d jî dûrahiya veqetandinê ya pêşniyazkirî bi metre (m) ye. Divê hêza meydana ya ji veguhezkarên RF'ê yên bêliv û neguher, ku ji hêla lêkolînek cihê elektromanyetîkî ve hatî destnîşankirin ^a ji asta lihevhatinê di her navbera frekansê de kêmtir be. ^b Dibe ku li nêzîkî alavên ku bi sembola jêrîn hatine nîşankirin, astengî çêbibe: 
BALDAYNÎ 1: Li 80 MHz û 800 MHz'ê, navbera frekansa bilindtir derbas dibe. BALDAYNÎ 2: Dibe ku ev rêbername di hemî rewşan de neyên sepandin. Belavbûna elektromanyetîkî ji vegirtin û ronîkirina ji avahî, tişt û mirovan bandor dibe.			
a. Hêza meydana ya ji veguhezkarên bêliv û neguher, wekî stasyonên bingeîn ji bo radyo (telefonên desta/bêtêl) û radyoyên erdî yên livok, radyoya amator, weşana radyoya AM û FM û weşana TV'yê, bi rastî nayê pêşbînîkirin. Ji bo nixandina hawîrdora elektromanyetîkî ya ji ber veguhezkarên RF'ê yên bêliv û neguher, divê lêkolînek cihê elektromanyetîkî were hesibandin. Heke hêza meydana pîvandî li cihê ku Pergala KXL'ê lê tê bikaranîn ji asta lihevhatina RF ya sepîner a li jor zêdetir be, divê Pergala KXL'ê ji bo verastkirina xebata normal bê çavdêrîkirin. Heke performansek ne normal were dîtin, dibe ku tedbîrên zêde hewce bin, wek mînak ji nû ve rêvekirin an cînguhuştina Pergala KXL'ê. b. Li ser navbera frekansê 150 kHz heta 80 MHz'ê, divê hêza meydana ji 3 V/m kêmtir be.			

Dûrahiyên veqetandinê yê pêşniyazkirî di navbera alavên ragihandinê yê RF'ê yê hilgirbar û livok û Pergala KXL'ê de			
Pergala KXL'ê ji bo bikaranînê di hawîrdorek elektromanyetîkî de hatiye çêkirin ku tê de tengasiyên RF'ê yê tîrêjîrî tene kontrolkirin. Mişterî an bikarhênerê Pergala KXL'ê dikare bi parastina dûrahiyek herî kêmtir a di navbera alavên ragihandinê yê RF'ê yê hilgirbar û livok (veguhezkar) û Pergala KXL'ê de, wekî li jêr hatiye pêşniyazkirin, li gorî hêza derketinê ya herî zêde ya alavên ragihandinê, alîkariya pêşgirtina li astengiya elektromanyetîkî bike.			
Hêza derketinê ya herî zêde ya veguhezkar (W)	Dûrahiya veqetandinê li gorî frekansa veguhezkar m		
	150 kHz heta 80 MHz $d = 1.2\sqrt{P}$	80 MHz heta 800 MHz $d = 1.2\sqrt{P}$	800 MHz heta 2,7 GHz $d = 2.3\sqrt{P}$
0.01	0.12	0.12	0.23
0.1	0.38	0.38	0.73
1	1.2	1.2	2.3
10	3.8	3.8	7.3
100	12	12	23
Ji bo veguhezkarên ku bi hêza derketinê ya herî zêde ya li jor nehatiye lîstekirin, dûrahiya veqetandinê ya pêşniyazkirî d bi metre (m) dikare bi rêya bikaranîna hevêşeya sepîner ji bo frekansa veguhezkar were texmîn kirin, ku P li gorî hilberînerê veguhezkar, hêza derketinê ya herî zêde ya veguhezkar bi watt (W) e.			
BALDAYNÎ 1: Li 80 MHz û 800 MHz'ê, dûrahiya veqetandinê ya ji bo navbera frekansa bilindtir derbas dibe.			
BALDAYNÎ 2: Dibe ku ev rêbername di hemî rewşan de neyên sepandin. Belavbûna elektromanyetîkî ji vegirtin û ronîkirina ji avahî, tişt û mirovan bandor dibe.			



Pergala KXL'ê funksyoneke RFID'yê diheve ku li frekansa 13.56 MHz'ê dişîne û distîne. Dibe ku ev fonksiyon ji aliyê alavên din ve bê asteng kirin, hetta ew alavên din jî bi pêwîstiyên emîsyonê yê CISPR'ê re lihev bikin.

Pergala KXL'ê van veguhezkarên RF'yê yê jêrîn diheve:
RFID-Xwîn
13.56MHz Xwîner/Nivîser - Antena Yekparçe (Integral): Rêjeya Xwendinê ya Herî Zêde 4 inç - Hêza derketinê ya herî zêde 200mW e - Li gorî van standardan e: ISO18000-3, ISO15693

Emîsyonên herî bilind ên ku ji hêla alavên jorîn ve tene çêkirin li jêr hatine lîstekirin:

Fundamental (Bingehîn)	Frekans (MHz)	Asta (dB µV/m) li 30 m'yî	Sînor (dB µV/m) li 30 m'yî	Sînor (µV/m) li 30 m'yî	Marjîn (dB)
Benda 15.225(a)	13.56 (lûtke)	29.8	84	15.848	-54,2

Yên din	Frekans (MHz)	Asta (dB µV/m)	Sînor (dB µV/m)	Marjîn (dB)
Harmonics (Harmonîk)	27.12 (lûtke)	-5,2	29,5	-34,7
Spurious (Nexwazî)	200.6 (lûtke)	34,5	40,0	-5,5
Conducted (Guhêzbar)	0.199 (navgîn)	38,8	54,6	-15,8

Kontrola ji dûr a bêtêl a orîjînal, Jimareya Parçeyê

- FCC ID SXJ87027-TX
- Rêjeya Frekansê 2405MHZ heta 2475MHz
- Emîsyon li gorî 47 CFR Beşa 15'ê lihev e

Kontrola ji dûr a bêtêl a nûvekirî

- FCC ID 2AVGK-KXLTX
- Rêjeya Frekansê 2402MHz heta 2480MHz
- Emîsyon li gorî CFR Beşa 15'ê lihev e

6. SEMBOL / KURTEBÊJ

Dibe ku ev sembola li ser pergala KXL'ê, etîket an jî pakkirinê werin dîtin.

Sembol	Pênase	Cih
	Alternating Current (Herika Guhezbar)	labela pergalê
	Ji bo bikaranînê serî li talîmatan bidin	labela pergalê
	Protective earth/ground (Erda parastî; zemîna parastinê)	pergal
	On (Vekirî)	pergal
	Off (Temirandî)	pergal
	Stand-by (Rawestandî)	pergal
	CE Mark (Nîşana CE'yê)	labela pergalê
	Baldarî: Li ser alavê li nêzî cih	labela pergalê
	UV Light Hazard (Rîska Ronahiya UV'yê) (Ji bo hişyariyan serî li beşa 1.12 bidin)	li ser pergalê
	Keep away from rain (Ji baranê dûr bigire)	karton/qufî
	Fragile (Şikestî)	karton/qufî
	This way up (Ev alî jor)	karton/qufî
	Do not stack (Li ser hev neyînin)	karton/qufî

Sembol	Pênase	Cih
	Sînorên şiliyê (Humidity limits)	labela pergalê
	Sînorên germahiyê (Temperature limits)	labela pergalê
	Norên pestoya atmosferê (Atmospheric Pressure limits)	labela pergalê
	Ji bo Rezonansa Magnetîkî ne ewle ye (Magnetic Resonance Unsafe)	labela pergalê
	Tîrêja elektromanyetîkî ya ne-ionîzeker (Non-ionizing electromagnetic radiation)	labela pergalê
	Amûra bijîşkî (Medical device)	labela pergalê
	Sembola WEEE'yê (WEEE symbol)	labela pergalê
	Hejmara katalogê (Catalogue number)	labela pergalê
	Hejmara rêzê (Serial number)	labela pergalê
	Çêker (Manufacturer)	labela pergalê
	Rojeya Çêkirinê (Date of Manufacture)	labela pergalê
	Serî li Destûra/Rêbernameya Bikaranînê bidin (mecbûrî) (Refer to Instruction Manual/booklet mandatory)	labela pergalê
	Nûnerê Rayedar li Civaka Ewropî (Authorized Representative in the European Community)	labela pergalê
	Nîşandera Amûrê ya Yekta (Unique Device Identifier)	labela pergalê
	Çendanî (Quantity): Behsa hejmara amûr(an) ên di nav pakêtê de dike	etîketa karton/qutiyê

Kurtebêj			
°C	pileyî Selsius (degree Celsius)	min	deqe (minute)
A	amper (ampere)	mW/cm ²	mîlîwatt li ser santi metre çarçik (milliwatt per square centimeter)
CX	cross-linkinga reşika çav (corneal cross-linking)	nm	nanometre (nanometer)
EMC	lihevhatina elektromanyetîkî (electromagnetic compatibility)	OD	çavê rastê (right eye)
FW	firmware	OS	çavê çepê (left eye)
Hz	hertz (hertz)	sec	çirke (second)
IP	Parastina li hember têketinê (Ingress Protection)	UI	înterfeysa bikarhêner (user interface)
J/cm ²	jûl li ser santi metre çarçik (Joules per square centimeter)	UV	Ronahiya raser-binefş (UV) / Ultraviyole (Ultraviolet light)
kg	kîlogram (kilogram)	UVA	Ultraviyole A (Ultraviolet A)
LED	dîoda ronahîder (light-emitting diode)	V	Volt (Volt)
mbar	mîlîbar (millibar)		

7. TAYBETMENDÎ

7.1. Taybetmendiyên Pergalê

Taybetî	Şirove
Elektrîkî	Voltajên xetê 100–240 volt AC Herik 2A–1A Yek Qonax (Single Phase) RMS, 50/60 Hz Kontrola ji dûr ve 2x bataryayên AA (qelem) / Kontrola ji dûr a kevin 2x bataryayên AAA (nîvqelem)
Lîsteya Kabloyan û Aksesûaran	Kontrola ji dûr a bêtêl (Wireless Remote) Kabloya elektrîkê ya AC ya pileya nexweşxaneyê (Hospital Grade AC power cable) (Qilfbar / Jihevqetandî)
Radekirina Enerjiyê	Çavkaniya Ronahiya UV-A LED Hêza UV'yê: 3–45 mW/cm ² +/- 10% Enerjiya UV'yê: 1–10.7 J/cm ² Dirêjahiya pêlê: 365 nm +/- 8 nm
Lazera Arasteyê	Lazera Rêza 1 Hêz: ≤ 390µW Dirêjahiya pêlê: 650nm
Înterfeysên Derveyî	USB 2.0
Pîvanên Fîzîkî Pergala Bingehîn	Dirêjahî: 60 înc (152 cm) Panahî: 58 înc (147 cm) Bilindahî: 118 înc (300 cm)
Pîvanên Herî Zêde bi Dirêjkirina Tam a Baskê re	Dirêjahî: 129 înc (328 cm) Panahî: 110 înc (279 cm) Bilindahî: 150 înc (381 cm)
Giranî	NW 48 kg Giraniya Amûrê (Dixebite) GW 89 kg Giraniya Barkirinê (Di Qutiyê de)
Temena Batarya Kontrola ji dûr ve (di şertên xebata normal de)	18 saet
FCC ID yê Kontrola ji dûr ve û Dongle û Frekansên Xebatê	FCC ID: 2AVGK-KXLTX (Kontrola ji dûr ve) FCC ID: SXJ87027-TX (Kontrola ji dûr a kevin) 2.405-2.475 GHz.
Parastina Kontrola ji dûr ve ya li hember têketinê (ji bo tiştên di bin 12.5 mm de û bêyî parastina li hember avê)	IP53 (Kontrola ji dûr ve) IP20 (Kontrola ji dûr a kevin)
Şertên Jîngehî yên Xebatê û Embarkirinê	Pergal di bin şert û mercên atmosferê yên jêrîn de dixebite û dikare were embarkirin (bêyî berbestan / kondensasyonê)
Germahiya hawîrdorê	+15 heta +30 °C
Şilbûna têkildar	20% heta 80%, bêyî berbestan (non-condensing)
Pestoya atmosferê	810 heta 1050 mbar
Şertên Veguhestinê	Pergal li hember şert û mercên veguhestinê yên jêrîn bêyî zirar an xirabbûna performansê radiweste.
Germahiya hawîrdorê	-15 heta +60 °C
Şilbûna têkildar	10% heta 80% bêyî berbestan (non-condensing)
Pestoya atmosferê	750 heta 1060 mbar


7.2. Parametreyên Dermankirinê

Parametreyên Dermankirinê					
Cureyê Dermankirinê		Lasik Xtra®	Accelerated Epi-Off CXL (CXL ya Lezkirî ya Bêyî Rûpoşe)	Conventional Epi-Off CXL (CXL ya Kevneşopî ya Bêyî Rûpoşe)	Trans-Epithelial (Bî Rûpoşe)
Formûleyê		VibeX® Xtra	VibeX® Rapid	VibeX® Rapid	ParaCel Beşa 1, ParaCel Beşa 2
Dema Enduksyonê/ Dema Helmijînê	Default (Pêşbîr)	1 deqe 30 çirke	10 deqe	10 deqe	4 deqe (Beşa 1) 6 deqe (Beşa 2)
	Range (Sînor)	15 çirke–30 deqe	60 çirke–30 deqe	60 çirke–30 deqe	60 çirke–4 deqe (Beşa 1) 60 çirke–30 deqe (Beşa 2)
Şideta Teyisandinê	Default (Pêşbîr)	30 mW/cm ²	30 mW/cm ²	3 mW/cm ²	45 mW/cm ²
	Sînor*	*3 mW/cm ² –45 mW/cm ²	*3 mW/cm ² –45 mW/cm ²	3 mW/cm ²	*3 mW/cm ² –45 mW/cm ²
Doza giştî ya Raser-binefşê	Pêşbîr (Default)	2.7 J/cm ²	7.2 J/cm ²	5.4 J/cm ²	10 J/cm ²
	Sînor**	**1 J/cm ² –4.1 J/cm ²	**1 J/cm ² –7.2 J/cm ²	5.4 J/cm ²	**1 J/cm ² –10 J/cm ²
Radekirina UV'yê (UV Delivery)	Pêşbîr (Default)	CW (Pêvegirêdayî / Continuous)	Pulsed (Livokî)	CW (Pêvegirêdayî / Continuous)	Pulsed (Livokî)
	Sînor (Range)	CW û Pulsed	CW û Pulsed	CW (Pêvegirêdayî / Continuous)	CW û Pulsed
Dirêjîya Livan (Pulse Duration)	Pêşbîr (Default)	N/A (Ne sepîner)	1 çirke vekirî, 1 çirke girtî	N/A (Ne sepîner)	1 çirke vekirî, 1 çirke girtî
	Sînor (Range)	1 çirke vekirî/girtî – 4 çirke vekirî/girtî	1 çirke vekirî/girtî – 4 çirke vekirî/girtî	N/A (Ne sepîner)	1 çirke vekirî/girtî – 4 çirke vekirî/girtî
BALDAYNÎ: * Ji bo dermankirina CW'yê 3mW/cm ² herî kêr e; ji bo dermankirina Pulsed (livokî) 6mW/cm ² herî kêr e. ** Bikarhêner dikare Enerjiya UV'yê bi zêdebûnên 0.1 J/cm ² hilbijêre.					

8. PÊVEK 1

8.1. Legacy Remote Control (Kontrola ji dûr a kevin)

Di guhertoyên berê yê pergala KXL'ê de, kontrola ji dûr a kevin a li jêr hatî nîşandan dihat peyda kirin. Heke hê jî tu kontrola ji dûr a kevin bi kar tînî, ji kerema xwe ji bo agahdariya xebitandinê û çareser kirina pirsgerêkan serî li talîmatên vê pêvekê bid.



Teşe 45. Kontrola ji dûr a kevin – Dîmena Giştî

8.2. Hevgavkirina Kontrola ji dûr a kevin

BÎRXISTIN: Dema ku kontrola ji dûr ve tê bikaranîn, ji bo her pêvajoyekê hevgavkirin hewce ye.

Piştî ku rêxistin hatin hilbijartin, li ser ekrana piştrastkirina dermankirinê pê li "confirm" (piştrastkirin) bike. Pergal dê 15 çirke bide ji bo hevgavkirina kontrola ji dûr ve.

Ji bo ku kontrola ji dûr ve di nav wextê diyarkirî de hevgav bibe, pê li bişkoka hevgavkirinê ya ku bi "S" hatiye nîşankirin li ser kontrolê bike, wekî di wêneya jêrîn de tê xuyangkirin. Di dema hevgavkirinê de, Pergala KXL'ê dê her 2 çirkeyan carekê bibe deng.




Teşe 46. Kontrola ji dûr a kevin – Ekrana Hevgavkirina Kontrolê

Heke bişkoka hevgavkirinê ya li ser kontrola ji dûr ve di heyama 15-çirkeyî de neyê pelandin, rûpela rawestana hevgavkirina kontrola ji dûr ve xuya dibe. Ji bo ceribandina dîsa, pê li "OK" bike. Heke pirsgirêk dîsa çêbibe, ji bo pirsgirêkên muhtemel ên bataryayê, li ser rûpela pêş, beşa Troubleshooting Legacy Remote (Çareserkirina Pirsgirêkên Kontrola ji dûr a kevin) binêre.



Teşe 47. Kontrola ji dûr a kevin – Sync Timeout (Derbaskirina Dema Hevgavkirinê)

Heke kontrola ji dûr ve piştî gelek ceribandinan jî bi ser nekeve an di her kêliyê de bixebite, dermankirin dîsa jî dikare bêtî kontrolê berdewam bike. Ji bo berdewamkirina dermankirinê bêtî kontrolê, pê li “Continue” (berdewam) bike.



Teşe 48. Kontrola ji dûr a kevin – Sync Failure (Têkçûna Hevgavkirinê)

8.3. Çareserkirina Pirsgerê Kontrola ji dûr a kevin

Kontrola ji dûr a kevin xwedan çirayeke nîşander e ku rewşa xwe, wekî di tabloya jêrîn de hatiye hûrgilandin, radigihîne.

Nîşanderên Kontrola ji dûr a kevin	
Rewşa Çiraya Nîşander	Têgih
On (Vekirî)	Bi awayekî aktîv bi amûrê re hevgav bûye
Ji bo 10 çirkeyan, çirkeyê carekê dibiriqê	Hevgavkirinê qut dike (piştî prosedurê)
Bi domdarî, çirkeyê du caran dibiriqê	Baterî di cih de biguherîne (2 x AAA / nîvqelem)

8.4. Guhertina Bataryayên Kontrola ji dûr a kevin

Kontrola ji dûr a kevin xwedan bataryayên guherînbar e. Ji bo guhertina bataryayên di kontrolê de, zimanê li piştî kontrolê rake ji bo gihîştina parçeya bataryayê. Bateriyên biguherîne. Panela paşîn tîxe cihê xwe û bi zorake sivik bi cih bike.